

# Xezal

## Sîma Semend

NÛDEM

# XEZAL

## Sîma Semend

# XEZAL

## Sîma Semend

Çîrok

Tîpguhêziya ji kirîlî: Şefîk Kaya

Weşanên Nûdemê

Weşanên Nûdem: 26
Xezal
Çapa Yekem: Êrêvan 1961
Çapa Duwem: Stockholm 1996

© Weşanên Nûdem
Pergala bergê û rûpelan: Nûdem
Wêneya bergê:
ISBN: 91 88592-26 X

Navnîşan:
Termov. 52, 2tr.
176 77 Järfälla-Sweden

Tel û Fax: 8-583 564 68

# XEZAL

Bihar bû. Bihara Elegezê ya kin û bi gulan xemilandî, bû. Yên çûne Elegezê dikarin wê wextê wek cinetê xweş bi bîr bînin. Ew dikarin wê dema ku kulîlkên bînxweş dibişkifin, wê dema ku bîna gul û sosinan li her alî belav dibe, bi bîr bînin. Ew gulçîçekên ku ji meriv ra dibişirîn. Lê ew xulexula ava kaniyên sar, ku li deşt û mêrgan belav dibe û heta digihîje ber perrê çiya û baniyan? Ew cîhê ku çîveçîva çivîk û qebeqeba kewan jê kêm nabe, dengê çivîkan, qebeqeba kewan tevî dengê stranên qîz û xortan dibin û bi pêlên hewayê ra diçin, heta ku digihîjine cîhên dûr...

Ew ciyê wek cinet, gundê Elegezê ye. Çarnikalên Elegezê çiya û banî ne, ku kolxozên çîl û qerqaş ji meriv va têne xuyakirin. Ew çiyayên Elegezê...

Xelkên wir gişk xebathez in û bi marîfet in. Serê siban, şeveqê herkes bi lez û bez, ber bi xebatê va, ber bi deşt û cîhê kolxozê va diçe.

Sibeyeke biharê ya xweş bû, kolxozvanên gundê Elegezê ber bi xebatê va dilezandin. Du heval, Karê û Xezalê jî bi lez diçûne xebatê. Lê Karê melûl bû. Xezalê lê nihêrî ku Karê melûl e û xeber nade. Hema jê pirsî, got:

– Karê, tu çira wisan î? Ma diya te û bavê te nahêlin?

Xeberdana Xezalê hê di dev da Karê got:

– Ax Xezal, ez îşev qet ranezame. Me heta nîvê şevê wisan di ber hev daye; bavê min nahêle.

Wî kitêbên min gişk qelaştin, tu çi bêjî anî serê min û diya min. Bavê min dibê, "Na, nabe ku qîza min êdî bixwîne, wê heta koma

(polê) dehan xwendiye, bes e. Qîz çi ye, ku di xwendinxaneyên bilind da bixwîne!".

Gava ku Xezalê ev yek bihîst, weke ku risaseke sar ji serî heta binê lingan pê dabûye, ricif hatê; çavên wê tijî hêsir bûn lê, xwe zeft kir. Karê, wê hemêz kir, ew da ber dilê xwe û di ber dilê wê da. Xezalê got:

– Karê, tu jî mezin dikî, dikî efsane. Ma çi dibe, wî jî carekê got? Ji te weye bi rastî nahêle? Bavê min jî digot "Ez nahêlim", lê ez û diya xwe bi lavan, bi rica hatinê; bi qurban, bi heyran heta ew qayil bû. Rihê me pê ra kişiya. Tu qet hêvî û gumana xwe nebire, ê bihêle. Ez ê jî bêm jê lava bikim. De beşera xwe xweş bike. Wisan lêv, loperan neke ez nikarim bi vî mirûzî bi te ra bêm, ê bêjin çika me şer kiriye.

Wê Karê hemêz kir, maçî kir û herduyan bi ken li çavên hev niherîn. Te ê bigota herduyan jî dixwest bigota:"Hevaltî çiqas şêrin e".

Di wê demê da li pey wan dengê reperepa lingan û xeberdanê hat. Gava ji para zivirîn bala xwe danê ku xebatkarên koma wan in.

Qaçax û Baxço nêzîkî wan bûn û gotin: "Siba we bi xêr!" û tevayî çûne deştê.

Xezal û Karê nêzîkî hevalên xwe bûn û bi ken gotine wan:

– Selam hevalino, ji we ra qewet be!

Wan jî bersiv dan, gotin:

– Selam, li ser çavan, li ser seran!

Paşê yekê pirsî:

– Gulino, hûn li kuderê bûn, hûn ji bo çi bi derengî ketine? Wele em bê we melûl in.

Berpirsiyarê karkeran Avagyan got:

– Bi rastî, hûn gulên birîgada me ne.

Wan jî got:

– De bes e, bi me henekan bikin, niha rindtir e ku em bixebitin. Herduyan bi hev ra wisan gotin û bi kêfxweşî dest bi karê xwe kirin.

Karê û Xezal bi kel û cehd dixebitîn. Wan şalik ser şalikê pincar ji nava zeviyê top dikirin û vala dikirin. Heta Qaçax û Baxço komek dicivandin, dibirin serê kewşen. Wan lodek dinê bilind dikir. Heta wextê nanê nîvro ew wisan bi hewes dixebitîn, lê Qaçax û Baxço te hew dinihêrî wa ye sekinîne, bi hêrs bi hev ra xeberdidan. Wextê nanê nîvro herdu, êdî kêrt û kal bûn jihalketî bûn. Ew rûniştin û bi hev ra axivîn. Baxço bi hêrs li Qaçax nihêrî û gotê:

– Qaçax, ev gişk şaşiya te ye, te em kirine vî agirî. Divê tu li bal Xezalê bixebitî. Ku te bi ya min bikira, em ê li bal Sînemê û Meyro bixebityana. Ew bi xwe mîna van bê Xwedêyan nîn in. Tu dibînî çiqa rehet dixebitin? Van malik li me xerab kiriye. Pişta me kirine ber me. Kuro, tu qet bi ya min nakî; Xezalê tu caran te nastîne. Weleh perda reş hatiye ser çavên te! Tu nabînî ew qet nizane tu heyî yan tuneyî. Lê ez ji te ra rastiyê bêjim: ew qet sêva devê te nîn e! Kuro, ew ê te tî bibe ser avê û tî bîne! Ew qîz ne li gor te ye, naşîtê naşît! Tu çi dibêjî mehrum, tu bi mêraniya xwe nikarî bigihîjî xebata wê. Tu nagihîjî wê ka binhêre em ketine. Em êdî ketine lê, wan lodeka bi qasî bejna te bilind kiriye û newestiyane jî...

Qaçax berê xwe da wî û got:

– Baxço, ma ne bes e? Min carekê ji te ra gotiye: "Gere ez vê qîzê bixwazim. Heke ew min nexwaze jî ez ê wê birevînim. Ez ê... ez ê...

Di wê demê da xebatkaran gazî wan kirin, ku herin xwarinê bixwin.

Xezal û Karê jî hatibûn. Xebatkar gişk civiyane serhev û dest bi xwarina xwe kirin.

Berêvar bû, ji bal kolxozvan vedigeriyane malê. Ji dûr va dengê kolxozvanan yê şêrîn, dengê kilamên qîz û xortan dihate bihîstin.

Kevaniyên kolxozê bêdrokên wan di mil wan da, ber bi şûna çêlekan va diçûn, Xezal û Karê jî, ji xebatê dihatin.

Gava Xezal hate malê diya xwe maçî kir, rûnişt û nanê xwe xwar. Te digot qey diya wê dixwest jê ra tiştekî bêje. Lê dinihêrî û careke din di ber xwe dida. Gava Xezalê xwarina xwe xwar, xelas kir, diya wê gotê:

– Diya Qaçax Henê, li mala me bû. Gelek xeber di ber min ra avît, di derheqa te da. Lê min tiştek jê ra negot. Wê paşê bi ken got: "Em ê di nêz da bibin xinamiyê hev!". Ew ê van rojan xwazgîniyên te bişînin.

Gava Xezalê ev yek bihîst, hêrs bû û ji diya xwe ra got:

– Dayê, gere te jê ra bigota, bila badîhewa neyên, bila xwe sivik nekin û bila li wî kurê xwe Qaçax e çi kureder e jî şîretekê bikin. Ew hê zaro ye, gede ye. Ew çi ye, zewac çi ye? Çav bi bejn û bala kurê xwe ketine lê, nizanin dara pûç e. Yekî bê hiş û feresat e. Dayê, em bi hev ra li cîhekî dixebitin û ez wî pirr rind nas dikim. Wisan jî cankesir e, wisan jî qure ye. Tu ê bêjî ew e ku heye. Ez heta wî didim xebitandin rihê min dikişe. Ew jî zaf ji min vedikişe. Lê, xebatkarên din, kesek nikare jê xeberde. Bersiva wan dide û wan bêhurmet dike. Hema ji ber vê yekê jî rûmeta wî li ber çavên min ketiye. Ji min ra wa tê ku ew nanê para min dixwe; Pirr bêhesiyet e.

Diya wê got:

– Lê Xezala min, mala wan xweş e, çira tu di derheqa wî da wisan difikirî; ew hê cahil e, ê bi aqil bibe. Ez diya te me, bi min xortekî ne xerab e.

– Ax, dayê can, wextê min û mêrkirinê nîn e. Min ji te ra gotiye, ez dixwazim bixwînim. Ez hê zaro me, ez ê bixwînim, bibim dok-

tor.

– Doxtir?

– Erê, anê can, ez ê êdî nehêlim ku serê te bêşe, ez ê ji te ra cure cure dermanan hazir bikim. Tu ê vexwî û sax bibî.

Diya wê got:

– Qîza min, gelek baş e, bi rastî tu tiştekî pirr pak fikiriyî. Lawo, hûn çiqas bextewar in. Hûn di welatekî weha azad da dijîn! Di orta mêr û jinan da ferq tune. Lê qîza min berê... Tiştekî eyb bû, ku qîz di derheqa xwendinê da bifikiriyana. Hema belengazan hinekî çavên xwe vebikirana, ji dinê fêm bikirana, hema ew didane mêr. Qet pirs nedikirin gelo qîz dixwaze yan naxwaze. Heke dê û bavê wê bixwestana êdî qîz çi bû! Ew didane mêr. Ew ne mêrkirin bû, weleh hema hema ew difrotin. Te dît va êvarekê pênc-şeş giregirên gund hatine û dest bi kirrîn û firotina xwe kirin; bê razîbûna qîzê. Bavê qîzê digot: "Bîst pez e, qelenê qîza min" an jî panzdeh hezar. Bavê kur û qîzê heta nîvê şevê di ber hevdu didan. Paşê, wexta razî dibûn, gazî qîzikê dikirin, gustîlkekê, tiştekî pê va dikirin û diçûn. Êdî nedipirsîn gelo ê pêşeroja wan çawan be. Lawo, ew bêbext bûn. Niha cahilên wisan çûne. Te bidîta, hinekan xwe ji kerba dikuşt, hinekan jî nikaribûn di destê mêran de îdare bikira, carkeke din vedgeriyan, dihatin mala bavên xwe. Yên ku ji derdorên xwe şerm dikirin, emrê xwe wisan bi derd û kul derbas dikirin. Aha lawo, heyata me ya berê ev bû. Hûn bextewar in, hûn bextewar in, hûn di vî welatê azad da dijîn.

– Erê dayê, ez razî me, ez ji jiyana xwe zaf razî me. Ji bo vê yekê em deyndarê Lenînê mezin û Partiya Komunîst in. Gereke em ji bo xebatê qeweta xwe nehêvşînin. Divê em rind bixebitin, ku di vî welatê xwe yê serbest da komunîzmê çêkin.

– Lawo, Xwedê bi te ra be! Heke tu hebekî min şa bikî. Min rojên giran, derd û kul pirr dîtine; ez zaf hatime zêrandin. Heke tu

di dewsa wan derdan da bi dermanekî diya xwe şa bikî, qîza min?

Xezal nêzîkî diya xwe bû, ew hemêz kir.

– Erê dayka min ya ezîz, ez ê hemû tiştî bikim. Heta ji destê min bê ez ê dayka xwe ya ezîz şa bikim. Ez niha mezin bûme û hemû tiştî fêm dikim. Ez ê wisan bikim, ku rojên xwe xweş derbas biakim. Ku hezar heb xweziya xwe bi Xezala te bînin.

Zeynebê van gotinên qîza xwe bihîst û di dilê xweda şa bû. Ji şabûnê hêsirên wê mîna taviyên teyrokê dibariyan, gote qîza xwe:

– De rabe, rabe kevoka min bes e, rabe Xwedê bi te ra be êdî nîvê şevê ye, rabe û razê. Da tu sibê zû rabî, delaliya min.

Gava Zeyneb rabû, hê tarî, berbanga sibê bû. Ji xew rabibû, ku here tewla dêwêr, lê gava dîna xwe da ciyê Xezalê, mat ma. Xezal piştgirêdayî li ser ciyê xwe rûniştî bû û kitêb di dest da, dixwend. Ew wisan niqoyî nav xwendinê bûbû. Diya wê qet texmîn nedikir, ku Xezalê hê şiyar e; xwe nêzîkî wê kir, li kêleka wê rûnişt, got:

– Xezal, qîza min, ne tu gune yî, çira weha bi serê xwe dikî, çiqas rojê halê te ev e, hê çavê sibê ronî nebûye tu rûniştiyî û dixwînî?

Xezalê çavên xwe yên reş mîna hebên tirî ji kitêbê da alî, li diya xwe niherî û ew hemêz kir, got:

– Lê çawan dayê can? Meriv bê zahmetî nikare bigihîje mirazê xwe. Ez dixwazim bibim doktor ji bona vê yekê jî lazim e biçerçirim, bixwînim, hîn bibim da bikaribim îmtîhamên (azmûnên) qebûlkirinê bidim.

Zeynebê kire niçeniç û serê xwe hejand, got:

– De Rebê alemê mirazê te bîne cî û ev cefayê te daye li haşê neçe; lawo, ez çi bêjim?

Diya wê van gotinan got, rabû û çû.

Xezalê bala xwe dayê heta wextê kar hê wextê wê heye, careke

mayin niqoyê nav xwendinê bû. Wê saetekê wisan xwend. Gava lê nihêrî êdî wextê xebatê ye, rabû, hahaka ew der danehev, der û sivder gezik kirin, bêdrok hilda û çû avê. Ew li wir rastî Karê hat, ku ber bi mala wan va dilezand. Gava wê ji dûr va Xezalê dît, lê kire gazî:

– Xezal, bilezîne, dereng e!

Ew bi lez nêzîkî wê bû. Herdu bi tevayî çûne malê. Xezalê avê valayî kurnê kir, devikê kurnê girt û du-sê nanên tendûrê yên loş hilda, çû navmalê. Diya wê dew dikila, got:

– Dayê, ez va diçim. Ji bona taştê çi bi xwe ra bibim?

Zeynebê hahaka çû û ji sîtla ku qatix tê da meyandibû, toyê ser mîna zolê çerm ji ser girt, kire nava nanê loş, pêça û paşê hinek rûnê berkilê jî kire navê, pêça û da Xezalê, got:

– Ha qîza min, de here heta nîvro diya te dê nanê te bîne. Xezalê nan ji destê dê girt û ji kîlerê derket. Di sivderê da ew rastî Mecîd, bavê xwe hat, ku pez û dewar rastkiribû, vegeriyabû û hatibû malê. Mecîd ku çav bi herdu hevalan ket, bi ken got:

– Siba we bi xêr, qîzên delal! Hûn dilezînin da herne xebatê? De herin, herin wextê we û xebatê hindik ma. Hûn ê du-sê mehên din vegerin, herin xwendinê û me tenê bihêlin.

Keçikan ji hev ra gotin: “Xwezil bi wê rojê” û çûne ser karê xwe.

Gava ew gihîştine ciyê xebatê, hêweze ketibû nav xebatkaran, li ciyekî top bûbûn, tu kes nedixebitî. Xezal û Karê li nav çavên hev niherîn, dixwestin pê bihesiyana gelo çi bûye. Lê herduyan jî taqet nedikir ji hev bipirsin. Bi wî awayî herdu jî kerr û lal çûn bal hevalên xwe. Paşê kifş bû, ku çi qewimî ye. Xebatkar gişk li Qaçax û Baxço civiyabûn. Serê Baxço girêdayî bû; di ber laçikê ra xuna gewez dabû der. Wî xwe bi vir da bi wê da li badikir, lê ew bernedidan. Qaçax jî xwe dirêjî wî dikir, lê ew jî bernedidan. Qî-

zikan ji Xezal û Karê ra gilî kirin, ku Qaçax bi piyan hatiye deştê û çawan di nav hêşînayî da razaye. Baxço hatiye, dîna xwe dayê, gotîye: "Here malê, hinek an jî berpirsiyar te bibîne ne baş e!". Hema di wê demê da ew rabûye, çêrî Baxço kiriye û hîtek hildaye, li nav qafê Baxço xistiye. Gava xebatkar vê yekê dibînin, nahêlin li hev bixin, gazî yê berpirsiyar dikin.

Ev ne cara pêşîn bû, ku Qaçax ev nereheti dikir. Loma jî, ji Xezalê ra ne tiştekî teze bû. Di wê demê de, ji dûr va dîtin ku berpirsiyar û çend xebatkarên din ber bi wan tên. Keçikan dîsan li hev nihêrî berpirsiyar li Qaçax û Baxço niherî, paşê pirs û pirsyarin ji xebatkaran kir. Wî gote karkerên din ku ew bixebitin. Lê, Baxço û Qaçax herine gund. Paşê got, ku bila xebatkarên din jî gişk bêne civatê. Êvarê dîsan berpirsiyar rabû ji çend xebatkarên din jî pirs kirin. Paşê got ku karkerên mîna Qaçaxê tiral û serxweş ji kolxozê ra ne lazim in. Serokayetiyê qerar girtiye, ku nehêlin Qaçax di kolxozê da bixebite; heta hişê wî neyê serê wî, li ser piya nesekne, nikare bixebite. Xebatkaran gişk ew qerar baş dîtin.

Xezalê soz dabû Karê, ku êvarê, piştî xebatê, here mala wan û di derheqa xwendinê da bi bavê wê ra xeber bide. Gava ew gihîşte ber deriyê wan, dengê merivên nenas ew dan sekinandin. Ew gavikekê li ber derî sekinî, paşê çû hundir. Di sivderê da ew rastî diya Karê hat. Gava ku wê Xezalê dît pirr kêfxweş bû. Wê Xezalê bire navmalê, bal Karê. Karê medekirî bû, ku mêş di ber ra biçûya ê perçe perçe bibûya. Ew ber bi Xezalê hat, xwe avîte pêsîra wê û bû îskeîska wê, got:

– Xezal, min ji te ra nedigot bavê min nahêle ez bixwînim? Te dît gotinên min çawan rast derketin? Di ser da jî min dide mêr! Min dide yekî wisan ku min ew di xewna xwe da jî nedîtiye, ez nizanim kî ye, kî nîne. Çipîn ji derî hat, Biroyê bavê Karê ji der va bi ser van gotinan va hat. Gava wî dît ku Karê digirî damarên eniyê

tevlihev bûn. Irrîneka wisan jê hat, te ê bigota ew di wê saetê de perçeperçe bû. Wî çavên xwe li Karê cinû kirin û dîsan kire irrîn. Bi hêrs got:

– Qancix! Ma bes nîn e, tu min bêrûmet dikî? Tu heta koma dehan çûyî, te kuta kir êdî bes e! Ez nahêlim tu herî xwendinê, ew jî li Erêvanê û bi tenê di nav mêran da... Haho... ma qey min serê xwe daniye, ez di bin ax berên sar da me, erê? Kîjan qîz ku dixwaze bi tenê here bixwîne û li Revanê, bê xwedî ye. Lê ez Biroyê Şemo me, sax im, ne mirî me, ez nahêlim qîza min tenê here cîhên dûr. Na, qurba, ev yek nabe. Xezalê di kur ra ev yek bihîst?

Ji hêrsan êdî nikaribû gelek tişt rehet xeber bida. Xezalê got:

– Apê Biro, ev deh sal in ez te nas dikim, têm diçim û weke qîza malê me, min tu caran bawer nedikir, ku tu ê gotinên wisan bêjî.

Xezalê ev gilî û gotin, jê ra got û bi kelogirî nêzîkî Karê bû, ew maçî kir û bi dilşewatî gotê:

– Karê, delaliya min, gotinên te rastbûn, min nizanîbû bavê te... Wê xeberdana xwe kuta nekir û di derî va derket.

Wê şevê heta berbangê xew nekete çavên Xezalê. Ew difikirî ka gelo ê halê Karê çi bibe. Karê jî wê şevê helbet qet raneza, bi girî, bi axîn û keseran şevê derbas kir. Terîbana sibê ew rabû hahaka kincên xwe li xwe kir, gustîlka ku kiribûne tiliyê heliqande qutiyê û bêdrok hilda, çû avê. Ew wisan difikirî, ku ê Xezalê li wir bibîne, lê na. Xezal hîn nehatibû avê. Lew hê pirr zû bû. Bêdrokên xwe tijî kirin, por û poşman vegeriya malê. Gava ew hat diya wê êdî ji xewê rabûbû. Dema diya Karê wê dît şa bû, bi ken gotê:

– Qîza min, çi li te qewimî ye, tu vê tariya sibê çûyî avê? Tu şevê dinê dereng ketî nav ciyê xwe; tu hinekî ji xwe ra razayî?

Karê bersiva wê neda û çû hundir. Malê paqij kir û çû bal Xezalê. Ew hefteyek bû, ku Xezal nediçû xebatê, xwe hazir dikir da çendeyekî dinê here Erêvanê, îmtîhana qebûkirinê bide.

Ber xezalê tijî kitêb û defter bûn, dinivîsî û dixwend. Gava ku wê Karê dît, ji şabûna lingên wê erd negirtin. Ber bi wê çû û ew hemêz kir, got:

– Wîîî... Karê, te çi biaqilî kir, ku tu hatî. Min êdî nikarbû bixwenda. Rast e min li defterên xwe dinihêrî, lê hişê min li bal te bû, de zû bêje tu çawan î? Wan wê êvarê çi anî serê te?

Karê got:

– Xezal, ji bo çi ez nebêjim. Tu nizanî wî çi kir, ez dame mêr! Kuta bû, çû. Wî çawan xwest wisan jî kir, ez niha nizanim ez ê çi bikim. Bêje, ez çi xweliyê li serê xwe bikim?

Xezalê nizanîbû çi bersiv bida, çi bikira. Wê bi dilovanî li Karê nihêrî û got:

– Karê, xwîşka min, ez dikarim çi bibêjim. Me qerar girtibû, ku weha nebûna, niha jî bikaribim çi bikim? Bavê te mêrekî wisan e bi xebera xwe tenê dike; ew dixwaze çi bibêje tu jî bi ya wî bikî.Wan gelek xeberda, paşê Karê rabû, çû xebatê. Lê Xezal li malê ma û ji bo îmtîhanan xwe hazir dikir.

Çend rojan pişt re, hevalên Xezalê hatin, ew bi rê kirin. Tev heval û hogirên Xezalê, Qaçax jî hatibû birêkirina Xezalê lê, Xezalê qet guh neda wî. Qaçax kerr û lal li wê dinherî û qelûn li ser qelûnê dikişand.

Meha Tebaxê bû. meheka germ bû, di bin bayê germ da belgên daran yên hêşîn hêdî diçûn û dihatin. Di vê mehê de tu li ber deriyê kîjan înstîtûta Erêvanê binherî, tu ê bi sedan şagirt bibînî. Yên hatine ku îmtîhanan bidin; di wan xwendegehên bilind da bixwînin.

Li ber derê înstîtûya doktoriyê civiya bûn û pirs didane hev. Ji meriv wetirê dixwestin zanîna hev bipîvin, hev dicerbandin. Li ber derê odeyekê, bi qasî sî-çel qîz û xort civiyabûn. Wan ji kîmyayê îmtîhan dida. Ji nav wan pêcn-şeş xortan îmtîhanên xwe da-

bûn û puanên baş stendibûn lê, hê jî tu kesî yên pirr rind nesitendibû. Xortekî dêmqemer di qelîşteka derî de li odeyê dinihêrt û got:

– Ez dizanim ew qîzika bejnbilind ê pênc bistîne. Wisan tê kifşê ku wê xwe hazir kiriye.

Yekî din jî bersiva wî da, got:

– Distîne bila bistîne, tu dibêjî qey ê jî hesabê me bistîne.

Bi van gotinan ra ew qîzika bejinbilind ya çavreş ji salona îmtîhanê derket. Sûretê wê mîna hebên hinarê sor bûbûn, ji şabûna nizanîbû çi bikira. Hema hevalên wê li dora wê civiyan û pirs jê kirin:

– Te çi sitend?

Wê got:

– Pênc!

Qîz û xortên cem gotinê:

– Pirr baş e.

Keçik zêde nema, got:

– De bi xatirê we, ez ji we ra serkeftinê dixwazim. Piştî îmtîhanên mayin em ê rastî hev bên.

Yekî got:

– Xezal, em hev bibînin.

Rojên Tebaxa germ bi vî awayî derbas bûn. Xezalê ji berêva îmtîhanên xwe zaf rind dan û bîst û pêncê Tebaxê tev xelas kirin. Rojtira mayin nav û navnîşa wan şagirtiyên ku hatibûne qebûlkirin li dîwarê înstîtûyê xistibûn. Xort û qîz li ber wan lîsteyên navan civiya bûn. Lê nîvê wan jî medekirî û nîvê wan jî bi eşq bûn. Xezal jî li wir bû. Wê li listeyan nihêrî û navê xwe dît. Ji şabûnê madê wê yê bedew guherî. Paşê tevî hevalên xwe, ku di wextê îmtîhanên qebûlkirnê da hev nas kiribûn, di kuçeya Abovyanê ra berjêr bûn. Wan herduya qerar dabûn, ku wê rojê baş bigerin û bi

hev ra herne tiyatroyê.

Roja mayin Xezal bi dilekî şa çû Elegezê û pêrapêra çû cem Karê. Wextê karê pê hesiya ku ew hatiye qebûlkirin, bi dil û can hevala xwe maçî kir û pîroz kir. Di nav wan çend rojên ku Xezal li gund ma dîsan rihet nema hertim diçû cem karkerên hevalên xwe û komekî dida xebatkaran.

Sih û yekê Tebaxê bû, Xezal tevî hevalên xwe li ber otobosê sekinî bû, xeberdida; paşê xatir ji hevalên xwe xwest û li otobosê siwar bû. Otobos hêdîka bi rêket. Paşê ba girt, di nava deşt û çiyayên Elegezê ra, ber bi Erêvanê rê girt. Piştî çend saetan Xezal ji otobosê peya bû, li tramvayê siwar bû û ber bi razanxana înstîtûyê çû.

Yekê Îlonê, saet heyşt û nîv bû, reng û rûyê bajarê Erêvanê bi carekê va hatibû guhastin, soqaqên wê bi xort û qîzan tije bûbûn. Yên ku bi ken bi hev ra xeberdidin û ber bi înstîtûyan, û mekteban ve diçûn. Xezal jî di nav wan da bû. Ew tevî hevalên xwe ber bi înstîtûya xwe ya jê heskirî ve diçûn ji wan re şêrîn şêrînn derheqa Elegezê da şriove dikir.

Saet heyşt bû, zengilê salona dersa pêşîn lêxist lê, ew ne zengilê mektebê bû. Ew zengil ji bo yên ku teze hatibûn bû. Ji bo wan xort û qîzên ku wê salê ji bo xwendina bilind hatibûne qebûl kirin, bû. Bi vî zengilî ji Xezala Kurd ra ijyaneke teze vedibû.

Di dersxaneke beşê doktoriyê da, xwendevan li ser kursiyan rûniştibûn. Di nav wan da Ûris, Ermenî, Gurcî, Azerbeycanî, Kurd û ji miletên mayin hebûn. Gişka mîna yek merivekî guhdariya rektor dikir. Piştî dersê, Sêvê û Xezalê milên xwe kirine milên hev û bi eşq ber bi razanxanê ve çûn.

Rojên xwendevana li pey hev derbas dibûn. Pirr tê derbas nebû helbijartinên civata teşkîlata komsomolan hat, Xezal ji bo katibiya teşkîlata kursiya wan hat helbijartin. Xezalê xebata mexûlqeti-

yê jî dikir û alîkarî dida hevalên ku ji dersan li paş diman.

Rojekê, di civata teşkîlata komsomolê da, xwendekaran pirs danîn, da Xezal komekiyê bide Ahmo û Anîkayê. Paşê dihat xuya kirin, ku Xezalê ew çawan dida xebitandin wê ew ji bo îmtîhanan amade dikirin. Îmtîhanan dest pê kiribûn. Emekê wan hersêyan vala neçû. Civat rast dibêje: "Tu çi biçînî, tu dê wî biçînî". Wan îmtîhanên xwe zaf rind dan.

Rojekê Ahmo, nêzîkê Xezalê bû û got:

– Xezal, min bilêtên operayê kirîne, were em tevayî herin?

Xezalê got:

– Tu dizanî, ku sibê îmtîhana me heye, paşînê hetanî em vê jî nedin ez naçim tu cîhî. Divê tu jî neçî, niha here careke mayin dersa xwe rind bixwîne. Em îro naçine cîhekî.

Rojtira dinê, îmtîhanên xwe pirr baş dan û hema wê şevê, tev bi hev ra çûne operayê.

Piştî operayê bi eşq xeberdidan û ber bi razanxana xwe diçûn. Lê Xezal û Ahmo hêdî hêdî di dû wan da dihatin. Ahmo digote Xezalê:

– Xezal, ez tu caran, di jiyana xwe da hevaltî û dilovaniya te, ji bîr nakim; wê alîkariya ku te da min... Xezal, ez dixwazim wextê betlanê, havînê ji te ra nameyan binvîsim. Hêvî dikim ku tu ê bersiva min bidî?

Xezalê got:

– Ev çi gotin e? Ma meriv bersiva nameyan nade? Helbet ez ê bersiva nameyên te bidim.

Êdî gihîştibûn razanxanê. Xatir ji hev xwestin û ber bi odeyên xwe va çûn. Ahmo ji nişka va kire gazî:

– Bibexşîne Xezal, tu ê kengî herî?

Xezalê bi dengekî kubar got:

– Sibê na dusiba. De şeva te bimîne xweş!

Wê şevê Ahmo qet raneza di ber xwe da digot:"Sibê na dusibe" û careke din difikirî. Ew ji nişka va rabû di nav ciyê xwe da rûnişt. Wî xwe bi xwe digot:"Na ez ê sibê bêjime wê, êdî bes e, çiqas min xwe kerr kir. Na, ez êdî nikarim îdare bikim. Ez ê bêjime wê, yan na du rojên din pê ve dê here!".

Ahmo rabû lembeyê vêxist, kaxez danî ber xwe û dest pê kir ji Xezalê ra name nivîsî. Wextê nameya xwe kuta kir, careke din jî xwend.

Ahmo dîsan name xwend, xelas kir. Paşê qat kir, kire bin balgiyê xwe, ku sibe bide Xezalê. Bi wê fikrê jî raza. Sibê zû rabû, ji bin balgî nameya Xezalê derxist, careke din jî xwend; lê vê carê lê xweş nehat, qetand. Xwe bi xwe got:

"Na, wiha nabe, gereke ez xwe bi xwe bêjimê. Dibe hingê ew fêm bike, ku ev kaxez nikare derdê dilê bi evîn yê şewitî bêje?". Ahmo wiha fikirî û ji malê derket. Wextê ew derket Xezal û Sêvê jî peya dibûne jêrê, zembîl di destên wan da diçûne bazarê. Wextê Ahmo ew dîtin êdî ji bîr kir, ku ew bi çi fikrê ji malê derketiye û beşerxweş ber bi wan va çû, got:

– Siba we bi xêr, vê şeveqê wiha bi lez hûn ê bi ku da herin?

Gotin:

– Em ê herne bazarê, dixwazî tu jî were?

Ahmo bi eşq tevî wan bû. Ew di rex Xezalê da diçû, ji wî wetirê dinya ya wî ye. Gava gihîştine bazarê, mêwe kirîn û vegeriyan, hatine malê. Bi rê va Sêvê got ku ew ê saet di yekê da here malê û ew çû.

Wextê ku Ahmo û Xezal tenê man, wî teze bi bîr anî, ku ê çi bêje Xezalê. Lê hema di wê demê de Xezalê gote Ahmo:

– Tramvay hat, de em herin.

Ew çûn û Ahmo nikaribû jê ra tiştek bigota. Rojtira mayin sibê zû çû oda Xezalê ji bo ku wê bi rê ke. Ew çû odeya wê, sibexêrî

da Xezalê û gotê:

– Xezal, êdî saet heyşt e, zû bike em herin.

Xezalê got:

– Ez jî li hêvîya te bûm, ez hazir im.

Ahmo, Sêvê û Xezal di nav panzdeh deqan da gihîştine ber otobosê. Wî hûrûmûrên Xezalê bi cîh kir û peyabû. Xezalê bi destê wî girt û got:

– Ahmo, bibexşîne, ev du roj in ez zahmetê didime te. Lê bisekine, tu çira wisan melûl î, te çima rengê xwe avêtiye, dibe tu bêkêf bî?

Ahmo got:

– Na, Xezal na, ez zaf baş im, lê...

Xezalê destê wî berneda û got:

– Çi lê? De bêje, tu çira nabêjî, ma tu ji min şerm dikî, çi ye?

Ahmo serê xwe kir ber xwe û got:

– Na, ez niha nikarim tiştekî bêjim, wextê vegerê ez ê her tiştî ji te ra bibêjim, tu dê hingê bizanîbî. Sêvê li nav çavên Xezalê nihêrî û wê jî li nav çavên wê. Xezal sor bû û bi lez li otobosê siwar bû. Paşê otobus bi rê ket. Sêvê û Ahmo sekinîn û li otobosê nihêrîn; ew otobosa ku Xezala wan heskirî ji wan bi dûr xist, ber bi deşt û mêrgên Elegezê bir.

Ahmo li kêleka Sêvê sekinî bû û bê deng û his ji dûr va li otobosê dinihêrî, wî ji bîr kiribû, Sêvê li bal wî ye. Ew ketibû nav mitalan. Ew li wir ewqas sekinî heta ku otobus ji ber çavên wî wenda bû. Paşê serê xwe kire ber xwe û kesereke kûr kişand. Di ber xwe da got:

– Çû, miraza min çû, Xezala min...

Sêvê keniya, ew wê çaxê veciniqî, li Sêvê nihêrî û şerm kir. Sêvê milê xwe kire ber milê wî û got:

– Tu ji min şerm neke, ez xwîşka te me, de niha em herin, de-

reng e. Zêde nefikire, Xezal ê dîsan bê. Sêvê bi dilovanî gotê û bi hev ra çûn. Ahmo hate malê hûrûmûrên xwe top kirin, karê xwe kir û ew jî sibetirê çû Artaşatê, mala xwe.

Ew hefteyek bû, ku Xezal hatibû gund. Diya wê nedihişt ku bi ciyekî da here.

Her êvar ew li kêleka dê û bavê xwe rûdinişt û bi wan ra di derheqa jiyana xwendekariyê da, di derheqa Erêvanê û delaliya wê da, di derheqa Sêvê, mala bavê Sêvê, di derheqa dê û bavê wê agahdarî dida dê û bavê xwe. Digot:"Gelekî bi merîfet in, kesên qenc in.. Wê wisan jî digot: "Dibe ku Sêvê du-sê rojan bê bal me". Wê timî pirs ji dê û bavê xwe dikirin, pirs Karê dikir. Ew sê-çar meh bûn ku Karê li Çamûşvanê, bi mêr bû. Xezalê pirr dixwest ku ew bidîta lê nizanîbû bi çi teherî. Wê rojekê diya Karê dît û jê pirsa Karê kir. Pê hesiya, çendekî dinê ê wê bînin zeyê. Xezalê ku ev yek bihîst pirr şa bû û bi eşq hate malê; gote diya xwe. Diya wê jî gelekî şa bû, lew wê jî ji Karê hes dikir. Xezal çendekî di malê da ma, lê tebatî nedihatê. Hevalên wê dixebitîn û ew nikaribû li malê rûnişta. Wê qerar da ku here xebatê da komekî bide hevalên xwe. Wê wisan jî kir. Roja heyştan sibê zû rabû, gote diya xwe here deştê û alîkariyê bide hevalên xwe.

Wexta ew çû deştê û mexseda hatina xwe ji hevalên xwe ra got, ew pêşî qayil nebûn, bi Xezalê ra şer kirin. Li gor wan ew hatibê betlane, nehatibû kar. Lê wexta Xezalê gote wan, ew ê du mehan li wir bimîne û dixweze bixebite, hevalên wê hê qayil bûn.

Ji wê rojê hetanî roja çûyina xwe Xezal, di kolxozê da xebitî. Êvaran wexta dihate malê jî, ji diya xwe ra şêrin şêrin xeberdida. Lê wextê dikete nava ciyan, dikete nava xeyalan, Ahmo dihate ber çavên wê û gotinên wî diketine bîra wê:"Na, vegere, paşê...".

Tava nîvro însan diqjiland. Ji gund dengê kalekala pez ku teze ji çêrê vegeriya bûn, dihat. Pezdoşan (bêrîvan) dilezand, ku bigihîji-

ne bêriyê. Kebaniyên malan dilezandin da nanê palan zû zû bişî-nin û paşê jî herin goma pez. Di wê demê de otobosa Erêvanê gihîşte gundê Elegezê. Merivên di otobosê da tev peya bûn. Ji hemiyan derengtir qîzeke nenas ji otobosê peya bû. Hema dihate kivşê, ku ew e ne ji Elegezê ye, lew li dorberê xwe dinhêrî. Di wê demê da çend zaroyên biçûk ber wê bezîn. Qîzikê gazî wan kir, tiştek da wan û ji wana pirsî, gelo ew Xezalê nas dikin an na. Zaroyan gotin ku ew Xezalê rind nas dikin û dizanin ku li ku derê jî dijî. Ew di pêşiya wê ketin û ew birin ber derê Xezalê. Hingê diya Xezalê li bêriyê bû. Gava wê dîr, ku qîzek ber bi mala wan va diçe û birek zarok di pêşiya wê da ne, pêra pêra tê derxist ku ew qîzik ne ji wan deran e. Gava ew nêzîk bû, qîzikê selam da wê û pirsa Xezalê jê kir. Hingê wê jî pirsî dibe ku ew Sêvê be. Qîzik keniya, Zeynebê ew hemêz kir. Keçikê got:

– Dayê can, rasr e ez Sêvê me, te çawan tê derxist, qey Xezalê ji te ra gotiye, erê?

Zeynebê jî eniya wê maçî kir, got:

– Lê çawan, delaliya min, Xezalê herroj di derheqa te da şor dikir. Min êdî ji gotinên wê dizanîbû tu qîzeka wiha yî. Lê bisekine re çira xeber neda me, ku tu ê bêyî? Tu dizanî îro çendeyeke nameyên te nedihatin, ew ber xwe diket.

Sêvê careke mayin ew hemêz kir û got:

– Rast e, min xeber neda we, ji ber ku min nedixwest ez zehmetê bidime we, hûn bên ber otobosê. Paşê min xwest ez xapexap bi ser Xezalê va bigrim.

Zeynebê ew bire malê. Wê dixwest ku Xezalê zû bê malê. Ew li xebatê bû. Zeynebê nizanîbû ji şabûnê çi bikira. Wê Sêvê da rûniştandin, hahaka av anî; mêvanê serûçavê xwe şûşt. Paşê sifre danî ber. Sêvê xwarin hindik xwar lê tasa qatix kişande ber xwe. Zeynebê pez dot û berda, paşê dest pê kir ku şîr li sêbêratorê bixe.

Sêvê kir, ku ew destûra wê bide da alîkariya wê bike.

Zeynebê xatirê wê neşikand, Sêvê dest pê kir milê sêberatorê bada. Gava toxavik ji şîr veqetiya, di aliyekî da hat û şîrê binî jî di aliyê din da. Sêvê nolî zaroyeka çav bi xişmişkên bedew bikeve û firnax be timakar lê dinihêrî. Ew hata berêvarê deqeyekê rûnenişt, li ber destên Zeynebê diçû dihat.

Dema êvarê Xezal vegeriya malê, Sêvê xwe veşart û ji Zeynebê hêvî kir, ku tiştekî nebêje. Xezal hat serçavê xwe şûşt, rûnişt. Diya wê xwarin anî, danî ber. Xezalê got:

– Dayê, nameyên Sêvê ji min ra nehatine?

Zeynebê li wê nihêrî, texmîn kir ku ê qîza wê çiqas şa be ku bêje "Belê nameyên wê hatine", lê xwe zeft kir, got:

– Xezal qîza min, ku bihatana min ê pêrapêra bida te. Xezalê serê xwe kir ber xwe, got:

– Ax, gelo çima ev ewqas wext e ew nemeyan naşîne, yan jî nayê? Ha dayê, hebe tunebe tiştek li serê Sêvê qewimî ye, yan na ew ê tu caran wê bersiva nameya min ewqas dereng nedixist.

Wî çaxî bû pirqîna Sêvê û ji pişt derî derket. Xezalê demekê li wê nihêrî û ji çavên xwe bawer nekir; çavên xwe mizdan, girt, vekir, dît dîsan Sêvê li ber wê sekinî ye û jê re dikene. Hingê ew ji ciyê xwe rabû, hevala xwe hemêz kir, ramûsa, te ê bigota ev deh sal in wê nedîtiye. Paşê herdu heval li kêlaka hevdu rûniştin. Xezalê dest bi pirs û pirsyaran kir. Di derheqa heval û hogirên xwe da, di derheqa mala wan da pirsî. Sêvê jî pirs jê dikirin û awa heta nîvê şevê ew wisan li bal hev rûniştin û xeberdan.

Xezalê ciyê xwe û yê Sêvê di odeya jorîn da danî. Gava gişk razan, Sêvê bi nermî di derheqa Ahmo da gote Xezalê, ku ew ji bo Xezalê dîn dibe. Wê got, ku di pey çûyîna Xezalê ra rojtira mayin ew jî çûye. Zaf melûl û dilşikestî bûye. Xezalê dengê xwe nedikir, wê kerr û lal guhdarî dikir û di dilê xwe da şa dibû, ku Sêvê xwe

bi xwe di derheqa Ahmo da serê giliyan vekir. Wê dixwest, ku Sêvê dîsan xeberde lê Sêvê xebera xwe guhast, got:

– Xezal, rast bêje dilê te bi Ahmo va heye? Min zû da texmîn kiribû, lê culet nedikir, ku ji te pirs bikim. Xezalê bawer nedikir, ku Sêvê pirseka wisan jê bike, lê wextê hatibû pirskirin divyabû ku bersivê bide, got:

– Sêvê, ez hê nizanim, ka ji Ahmo hes dikim yan na lê ez ji tu kesekî mayin hes nakim; ew kurekî baş e.

Wê di derheqa Qaçax da hinek şor kir. Ji Sêvê ra got, ku ji hinga ew ji Erêvanê hatiye, ew bi şev û ro terka wê nake; diçe û tê, dixwaze xeberde, lê ew nahêle. Wê di derheqa Karê da jî ya ku ew du roj bûn anîbûn zeyî, şor kir. Bi vî awayî hete berbangê xeberdan. Berbangê, herdu jî di xew ra çûn. Xezal şeveqê rabû, çû serçavê xwe şûşt, gava hat dîna xwe dayê wa Sêvê jî rabûye û ciyan rast dike. Wê kir nekir nikaribû ji dest bigirta, Sêvê nivîn rast kirin. Xezalê jî der û sivder paqij kirin û herdu heval çûne avê. Wextê Sêvê derkete derva bîna cinetê ji mêrg û deştan dihat. Wê ew bîna xweş dikişand, li dorberê xwe dinihêrî û li wê bedewiya tebîetê şaş ma. Li wan çiya û baniyan, li wan gul û sosinên deştê, yên ku rengareng ji dûr va dihatine xuyakirin şaş ma, kêfxweş bû. Li ser kaniyeka sar, Sêvê serûçavê xwe şûşt û paşê vegeriyane malê.

Heta ew hatin Zeynebê êdî teştê hazir kiribû. Hêkerûn ji wan ra çêkiribû, toyê qatix, hingiv, feraqek jî toxavka teze danîbû ser sifrê. Herdu hevalan taştiya xwe xwarin û bi tevayî, bi eşq û şa çûne deştê.

Xezalê, Sêvê bi xebatkaran da naskirin. Ew bir li nav zeviyan gerand. Sêvê dît ku gişk dixebitin, lê ew naxebite, li wan dinhêre. Wê îdare nekir, ji Xezalê lava kir, ku bi tevayî bixebitin. Wê berê nizanîbû tirmix bikira. Tirmix li vî alî, li wî alî liba dikir; li lingên xwe dixist. Gîha nedikete ber tirmixa wê. Lê heta nîvro ew rind

hê bû.

Bi wî teherî, êdî Sêvê lingên xwe ji deştê nebirî bi Xezalê ra dihate xebatê û bi wê ra vedigeriya malê. Piştî xebatê jî yan ew diçûne bal Karê yan jî Karê dihate bal wan û heta derengî sibê ji xwe ra xeber didan. Karê xweziya xwe bi Xezalê û Sêvê dianî. Wê giliyê mêrê xwe, yê mala xwe ji wan ra dikir, digot:

– Xezal can, tu nizanî bavê min çi anî serê min? Ma min ew xort nas dikir, qet di xewnên şevan da jî ew nedîtibû. Paşê bila yekî pak bûya, bila min bizanîba? Kul ew kul e, qet nizane ez heme yan tune me! Ez nizanim bi ku da herim, çi xweliyê li serê xwe bikim; wî bihêlim û bêm, nabe. Ez ji navê xwe şerm dikim, ê sibê bikin şerm û bidin ruyê min, nehêlim neyêm jî ez ê li wir ji dest herim. Ez awa ketime orta du keviran, nizanim bi kîjan aliyî da herim?

Karê derdê xwe digot û pê ra jî digirya. Çavên Xezalê û yên Sêvê jî tijî hêsir bûn.

Êvarekê dereng Sêvê û Xezal ji mala bavê Karê diçûne malê, bi rê va rastî Qaçax hatin. Wan êvarxêrî di wî dan û xwestin derbas bibin, lê ew li pêşberî wan sekinî û gote Xezalê:

– Xezal, tu çima wisan bêînsaf î? Îşev çend şev in ez li benda te me, ka te çawan bibînim û derdê xwe ji te ra şirove kim. Ma qet Xwedayê te tune, tu nabînî ez ji bo evîna te eşqê li serê min xistiye? Ez dîn û har bûme, lê tu qet naxwazî ji min ra du xeberan bêjî û dilê min rehet bikî. Xezal, ruhê min jiyana min di destê te da ye, tu bixwazî tu ê min bikujî, tu bixwazî tu ê min bihêlî. Serê min bi min va nîn e, ez nizanim şev û rojên min çawan derbas dibin, ez li ber çi me. Halê min dê çawan be, bêje, horiya min? Roniya çavên min, bêje, ez bi ku da herim?

Xezalê nizanîbû çi bike, çawan rê bibîne û ji destên wî xelas bibe, got:

– Qaçax, şerm e, nîvê vê şevê ye, te ji bo çi riya me girtiye û nahêlî em herin? Şerm e, gundiyek niha rastî me bê yan jî bavê min me bibîne, dê çi bêjin? Tiştên te niha got, min deh caran bihîstiye û min bersiva te jî daye. Êdî çima tu hertim dibêjî? Min ji te ra gotiye û careke mayin jî dibêjim: Ez niha tu carî mêr nakim, heta ez xwendina xwe kuta nekim, mêr nakim. Paşê eger mêr bikim jî gereke mêrê min bi gotina min be, bi dilê min be, yekî ku ez bixwazim, yekî ku hesiyeta wî mîna ya min be. Lê ez û tu... Qaçax, em tu caran nikarin bi hev ra di eynî riyê de herin. De dereng e û bela xwe ji min veke!

Ev gotinên Xezalê mîna tîrekê navdilê Qaçax hingavtin, ling lê lerizîn, ber çavên wî reş bû, bû dûman. Mîna merivê serxweş şewişî û cî bi cî rûnişt. Serê xwe kire orta herdu destên xwe û kerr bû. Xezal û Sêvê xatir jê xwestin û bi lez çûn.

Roj dihatin û derbaz dibûn. Kesekî tê dernexist çawan tên û debas dibin lew herkes bi karê xwe va girêdayî bû. Sêvê û Xezalê tê dernedixistin ka roj çawan derbas dibin. Sêvê hatibû ku tenê pênc-şeş rojan bimîne, lê êdî panzdeh rojên wê bûn ku ew hê neçûbû. Ew ê hê jî bima, heke diya wê jê re li têlê nexista. Lê dê û bavê Xezalê qet nedixwestin ku ew here, wan bi qasî Xezalê ji Sêvê jî hes dikir. Sibetirê Sêvê bi rê kirin. Sê roj di ser çûyina Sêvê re derbas nebûbû, Xezalê ji Sêvê û ji Ahmo name stendin. Ew gelek şa bû.

Êvarê gava Xezal hate malê, pêrepêre rûnişt, ji Sêvê û ji Ahmo ra name nivîsî. Wê nivîsandina nameyan kuta kiribû, Karê hat. Karê herdu name dîtin, pirs kir, ku Xezalê ji kê ra nivîsiye. Pêşî Xezal sor bû paşê nîşanî wê da û got, ku yek ya Sêvê ye ya din jî ya hevalê wê ye; ji kursa wan. Karê li Xezalê nihêrî, keniya û got:

– Erê, delala dilê min, te ji min re tu tişt negotiye, hevalê te ye, lê ku wisan e tu çira wisan sor bûyî? Xezal bêhtir sor bû. Karê he-

mêz kir û maçî kir, got:

– Karê, tu dizanî ez tiştekî ji te venaşêrim. Di orta min û Ahmo da tiştek tune. Ez wî diecibînim. Xortekî zaf baş e, lê nizam paşê ê çawan bibe. Tev ev e, çi tê de heye, ku tu wisan li min dinihêrî? Tu dibêjî qey min gunehkarî kiriye. Wan pirr xeberda, paşê Xezalê, Karê bi rê kir û hate malê.

Ji çûyîna Sêvê gelek wext derbas bûbû, lê Xezalê nameyek tenê ji wê sitendibû. Ew çawan bihata malê pêrepêre ji diya xwe dipirsî, lê bi tirs bû: Mîna ku bêje:"Dibe îro bêje na, tunene". Te ê bigota qey Zeynebê niyeta qîza xwe fêm kir û gotê:

– Nameyek ji te ra hatiye, qîza min. Tu çira ditirsî? Niha rûne, nanê xwe bixwe, ez ê ji otaxa din bînim.

Xezal bi van xeberên diya xwe kêfxweş bû. Ew li hêviya diya xwe nesekinî, ber bi oda din çû, name hilda û lê nihêrî. Ew destnivîsara Sêvê bû. Wê hahaka vekir û xwend. Sêvê nivîsî bû

*"Selam Xezal can, bibexşîne ku xerab û kurt dinivîsim. Xuşka min a şêrîn, min gelekî bêriya te kiriye. Zû were, êdî wextê xwendina me hindik maye. Ahmo di nexweşxanê da ye û gelek xedar e. Dîsan dibêjim heke dikarî zû were. Ji ber min va li diya xwe, li bavê xwe û li heval û hogirên xwe li gişkan silav bike!".*

Sêvê

Xezalê xwend û hêsir ji çavên wê barîn, di wê saetê da çavên wê tiştek nedidîtin. Wê dixwest hema here, zû here bal Ahmoyê xwe. Lê nikarbû. Diviyabû ku ji diya xwe ra bigota lazim e du rojên din şûnda here.

Ew herdu roj ji bo Xezalê bûne sal, xewê şevan lê bûbûne hesret; tiştek nedixwar ne jî vedixwar, nikarîbû karek bikira. Deng jê biriyabû. Wexta diya wê jê dipirsî çi qewimiye, digot:

– Tiştek tune, anê can!

Piştî du rojan Xezal ji gund derket. Berêvarê saet şeş bû, wextê

Xezal gihişte Erêvanê. Ew ji otobosê peya bû û rast çû mala Sêvê. Wextê ew gihişte wir tirpetirpa dilê wê bû. Li zengil xist, diya Sêvê Şûşanê jê ra derî vekir. Gava ku wê Xezal dît, pirr şabû, ew hemêz kir, got:

– Tu di ser çavên min ra hatî, Xezal can! Kerem bike hundir, kerem bike, qîza min a delal! Me bêriya te kiribû. Sêvê herroj di derheqa te da xeberdida, lê van rojên dawîn rojên hatina te hesab dikir. Lê te bihîstiye, ku Ahmo ji gund anîne vira, kirine nexweşxanê? Dibên gelek xedar e. Sêvê rojê deh caran diçe balê, xwarinê dibe, lê tim melûl vedigere. Carina jî digirî û dibêje: "Pirr diêşe".

Xezalê êdî xwe wenda kir, bi destên xwe çavên xwe girtin û îske îsk pê ket te dê bigota her xebereke Şûşanê kulek dikire dilê wê. Wextê ew hinekî aş bû got:

– Xatiya Şûşan, tu nizanî ew di kîjan nexweşxaneyê da ye û nexweşiya wî çi ye?

Şûşanê got:

– Sêvê digot: "Ew ji Erêvanê çûye gund û otobosa ku pê çûne bi rê va wergeriyaye, lê Ahmo baş xelas bûye". Dibêjin: "Zaf ji serê xwe digazine". Xezalê got:

– Xatiya Şûşan, bila hûrûmûrên min li vir bimînin, ez ê herim binihêrim ka dikarim Ahmo bibînim yan na. Bi texmîna min Sêvê jî li wir e, em ê bi tevayî bêne malê.

Xezal bi lez çû nexweşxanê. Sêvê, Anûşavan û çend merivên nenas, ku kincên kurdî li wan bûn, rûniştî bûn. Sêvê ew dît, ber bi wê çû û xwe avîte pêsîra wê, got:

– Xezal can, çi baş e ku tu hatî, îro çend rojin çavên me li riya te qerimîn. Me bawer nedikir ku tu ê îro jî werî. Anûşavan hat selam da wê lê Xezal sar bûbû, nikarbû xeberda, got:

– Zaf xedar e. Nahêlin em wî bibînin. Me ewqas lava kir, nehiştin. Tişt nabe du roj mane em ê bêne piraktîkê û hingê em ê wî bibînin. Ev jî diya Ahmo, bavê wî û birê wî ne. Xezal sor bû, serê xwe kir ber xwe, nêzîkî wan bû, selam da wana. Diya Ahmo Xezal hemêz kir, kelogirî gotê:

– Qîza min Xezal tu yî? Ahmoyê min çiqas di derheqa te da şor dikir, çiqas pesnê te dida. Wextê nameyên te dereng dihatin, nizanîbû çi bikira, lê roja wî distend ji şabûna lingên wî erd nedigirtin.

Çavên Xezalê jî tijî hêsir bûn û ew jî giriya. Sêvê bi wan ra şer kir, got:

– We xêr e, hûn çima digirîn? Ahmo van rojan baş dibe û tê dersê.

Ew li wir gelek rûniştin. Lê dîna xwe danê destûra wan nadin, ku herne hundir bal Ahmo, çûne malê.

Yekê Îlonê bû, Xezal û Sêvê diçûne dersê. Wan qerar dabû ku ew ese Ahmo bibînin, wisan jî kirin. Piştî dersê çûne bal rektorê xwe, kaxez jê hildan, ku bihêlin ew piratisyen herne nexweşxanê. Pirs kirin ka Ahmo di kîjan odeyê da ye, çûne wir. Ahmo di nav ciyan da bû, çavên wî girtî bûn, serê wî girêdayî bû û di nav germê da disincirî. Wextê Xezalê ew dît çokên wê sist bûn, nêzîkî textê razanê bû, bi destê Ahmo girt, got:

– Ahmo can selam, tu çawan î? Wê bi dilovanî pirsî.

Ahmo çavên xwe vekirin. Te dê bigota qey wî di xewna xwe da Xezal û Sêvê dîtiye û bi wan ra keniya; destê Xezalê yê nerm givaşt û careke din çavên xwe girtin. Xezalê êdî nikarbû xeber bida, hêsirên wê nolî taviyên baranê ji jorda dihatin. Sêvê got:

– Ahmo can, bêje tu çawan î, tu îro hinek baş î?

Wî serê xwe hejand, dixwest bigota, ku ew hinek baştir e. Wî

nikaribû xeberda, lê bi destan dida fêmkirin. Xezal û Sêvê çûn, germpîvok anîn, germa wî pîvan sî û neh derece bû. Dereceyek ji ya herroj kêmtir bû. Ew şa bûn û gotne Ahmo:

– Ahmo can, îro germahiya te jî hinekî kêm bûye. Şikir çend rojên din şûnda tu dê bêyî dersê. Tu di derheqa dersan da nefikire. Em ê dersên te jî hazir bikin.

Bi vî awayî, roj bi roj Ahmo ber bi başbûnê va diçû.

Xezal û Sêvê timî diçûne balê. Rojekê, Xezalê gote Sêvê ku piştî dersan herin kulîlkan bikirin û herne bal Ahmo. Lê Sêvê got ku ew nikare. Diviyabû ku ew piştî dersan bi diya xwe re biçûya mala xwûşka xwe. Xezalê qirar girt ku tenê here. Piştî dersan çû gulin kirîn û çû bal Ahmo. Vê carê êdî Ahmo baş bû. Wî xelat vekiribû û di nav cîh da rûniştibû; qelema wî di dest da, dinvîsî. Wî Xezal nedît. Xezal çû hêdîka li kêlekê rûnişt. Bala xwe dayê ku ew şiêrekî dinivîse. Wê bi ken got:

– Ahmo, tu bûyî şayîr? Erê tu naxwezî qet li vî alî jî binêrî?

Ahmo ku Xezalê dît, sar bû. Wî ji çavên xwe bawer nekir, paşê got:

– Xezal, bibexşîne min te nedît û zû zû şiêra xwe hilda.

Xezalê got:

– Tişt nabe, lê te çima şiêra xwe zû revand? Tu çima vê şêirê ji min vedişêrî?

Ahmo sar bû, êdî bêbersiv bû, nikaribû tiştek bikira. Şiêr derxist û da wê, got:

– Ha..., bixwîne! Tiştek tê da tune! Ez vala bûm min xwest ji xwe ra binivîsim. Xezalê ji destê wî girt û xwend. Wî di derheqa qîzekê da nivîsîbû. Di derheqa qîzeka ku ew ji wê hes dike, lê qîz ji wî hes nake da bû. Xezalê xwend, keniya û da wî.

Xezalê got:

– Ma te ji bona vê yekê ji min şerm dikir?

Ahmo got:

–Xezal... erê... Tu rast dibêjî. Ez ji qîzekê hes dikim hem jî wisan hes dikim, ku tu kesî hetanî niha ji kesî hes nekiriye.

Xezalê got:

–Erê zaf baş e, lê tu ji kî hes dikî, ango kî ji te hes nake. Tu ewqas melûl î û di derheqa vê yekê da helbestan dinivîsî? Bêje, dibe ku ez ji te ra çarekê bibînim?

Ahmo serê xwe kir ber xwe û got:

–Erê Xezal... hema tu yî! Heke dikarî dilê min î birîndar derman bikî, bike! Tu çi bixwazî tu ê bikî, tu bixwezî tu ê min bikujî, tu bixwazî tu ê min sax bikî.

Te dê bigota qey Ahmo ev xeberdana han ji bêhişî got. Ew bê hemdî xwe diaxivî. Wextê Xextê ev axaftin bihîst te ê bigota teze rih hate laşê wê. Gava Xezalê ev xeberdan bihîst, te dê bigota qey rihekî teze hatê. Li Ahmo nihêrî û ji şerma serê xwe kire ber xwe û got:

– Ahmo, tu çi dibêjî? Ez çawan dikarim te bikujim, ne ku ez te bikujim ez ê jî bimirim? Lew tu jî hekîmê dilê min î!

Ahmo ji şabûna nizanibû çi bikira. Bi destê wê girt, got:

–Xezal, dinyayeke teze ji min ra vebû.

Xezalê êdî şerm kir, rabû, lê niherî, xatir jê xwest û çû.

Piştî çendeyekî Ahmo ji nexweşxanê derket, lê hê baş bi ser xwe va nehatibû. Doktoran ew çendeyekî ji dersan azad kirin û çû gund. Ew piştî maweyekê hate dersên xwe.

Evîn û heskirina Xezalê û Ahmo roj bi roj pirrtir dibû, ew bêî hev nediçûne tu cîhekî, bêî hevdu tiştek nedixwarin. Tevayî diçûne kitêbxanê, ders dixwendin û tevayî dihatin.

Di înstîtûyê da pesnê wan dihat dayin; di derheqa dersên wan

da, di derheqa aqil û kemala wan da xeber didan. Pênc sal bi vî awayî derbas bûn. Pênc salên evînî û yên xwendekariyê, salên şêrin...

Ev herdu ciwan di kursa şeşan da bûn. Ew bi tevayî ji bona îmtîhanên dewletê hazir dibûn.

Rojên Gulanê yên xweş in, deşt û zozan, bax û bostan tev kemilîne. Hergav, sibê şeveqê Xezal û Ahmo kitêbêd xwe hiltînin û diçin nava baxê li ser navê şoreşgêrê eyan Gûkasyan û xwe ji bo îmtîhanan hazir dikirin. Paşê car–caran wextê ku vala dibûn di derheqa jiyana xwe ya pêş da diaxivîn; difikirîn ka ê çawan ji xwe ra malê daynin, ji xwe ra hûrûmûrên navmalê bikirin û bi dilê xwe tiştên xwe di nav malê da bi cîh bikin. Carina jî piştî xwendina kitêb û ferhengên xwe vedikirin û ji hev pirsan dikirin. Bi vî teherî rojên berî îmtîhanan derbas dibûn.

Êdî roja îmtîhana dewletê ya pêşîn bû. Wê rojê, wek Xezal û Ahmo wisan jî xwendekarên mayîn di cîhê xwe da qet rehet nedisekinîn ango diçûn û dihatin. Bi bêdengî û bêhisî di qesra enstîtuyê da rûniştî bûn û dibihîstin çika hevalên wan çawan îmtîhan dibin.

Wê rojê Ahmo û Xezalê îmtîhanên xwe bi qîmetên zaf rind dan. Wan îmtîhana xwe ya mayin jî pirr xweş da.

Ji şabûna lingên wan erd nedigirtin. Şa dibûn, lew bi serfîrazî enstîtuyê xelas kiribûn. Tayina Xezalê ya doktoriyê dabûn nexweşxaneya gundê Elegezê. Lê ya Ahmo dabûn Artaşatê.

Xatir ji hev xwest in, şiklên xwe dane hev û ji hev qetiyan. Lew wesayitên wan êdî bi rê diket. Ahmo nedixwest destê Xezalê berde. Wî li nav çavên wê dinhêrî û mîna zaroyekî ku dixweze bigirî lêva xwe daliqandibû.

Xezal jî ne di halekî baş da bû. Wê jî çav û birûyên xwe tevîhev kiribû, nikaribû li Ahmo binhêriya. Ditirsiya ku bigirî. Ahmo bi

dilekî birîndar ji otobosê peyabû û otobos bi rê ket.

Xezal gihîşte malê, hîn roj li nîvro bû. Zeyneb tenê li malê bû. Gava wê Xezal dît, dinya lê ron bû. Mîna qîzeke çardeh salî li ber qîza xwe reqisî, ew hemêz kir; ramûsa û got:

– Şikir, şikir ji vê rojê ra! Qîza min ya şêrîn, te bi serfîrazî xwendina xwe kuta kir û doktor vegeriyayî malê. Ev ji min ra hêjaye malê dinê. Ez îro gihîştime mirazê xwe, meramê min hate cîh. Şikir ji vê gavê ra. Lê Xezal, te negot tu dê li kuderê bixebitî?

Gava dê pê hesiya ku ew ê li gund bixebite, şa bû. Qîza wê dibû doktora gund? Çi keremeke mezin e! Di wê demê da bavê Xezalê bi cînarên wan va hatin. Bavê wê ji diya wê zaftir şa bû. Wê şevê ew heta berbangê ranezan. Dê û bavê wê li kêleka qîza xwe rûniştin, pirs û pirsyar jê kirin. Heftek jî derbas nebû Xezalê bû doktorê gundê Elegezê.

Di nav mala Hemîd da şîn û girîn bû. Kurê wan yê biçûk Erfût, bêhal bû. Qirik û gewrî li wî tijî bûbûn û nikarîbû xeberda. Cînarek diçû, yek dihat. Gişkan digot "Ew ê bimire!".

Êvarê, gava Xezal hate malê, diya wê di derheqa Erhût da pê ra qise kir û got ku diya wî naxweze gazî doktor bike, ew dibêje "Doktor ê kurê min biavêjne bin kêrê".

Xezalê êdî xwarin nexwar, xebera diya xwe di nêvî da hişt, derman û derziya xwe hilda, di derî va derket. Diya wê jî da pey. Lê mala Hemîd dûrî mala wan nebû, zûtirkê gihîştine wir. Gava Xezalê derî vekir, dît ku hewa zaf giran e. Cîhê ku nexweş paldabû tijî bûbûn, lûbe–lûba wan bû. Diya nexweş li ber serê wî rûniştibû, dilûrand. Yên din jî digiriyan. Şêxa gund Werda li kêleka diya nexweş rûniştibû. Wê jî qewl û ayet digot û bi diya nexweş ra şer dikir; ku neke qajîn û gede duruh neke. Gava Xezalê ev yek dît, hew îdare kir. Ew nêzîkî nexweş bû, hilke hilka wî bû. Xezalê destê wî girt, germahiya laşê wî pîva. Paşê derzî hazir kir, ku derziye-

kê lê bixe. Şêx Werda ku hîn qewla xwe temam nekiribû, kire qajîn:

– Wîîî... Xwedê, gunehên min zaf in, ev qîzik çi dike? Çi ji vî tifalî dixwaze? Gede dê biherimîne, bi van derziyên xwe yên heram! Gedê cinetî dê biherimîne... Sînem te porê xwe kur kirê! Tu çi sekiniyî û lê dinhêrî, kûrbûyê li ber çavên te dergûşa te diherimînin! Gede va can dide, bi ruhsitînê xwe ra şer dike, ew jî hatiye wî diherimîne! Xwedê... tu kevir û kuçan bi serên me da bibarînî! Zulma weha jî dibe? Li min gunehkarê?

Werdê xeberdana xwe didomand, Xezalê derzî hazir kir, derman kişandê û nêzîkî gede bû. Di wê demê de Sînemê kite qijîn, xwe avîte ser gede, got:

– Haho...! Tiştekî wa nebûye, ez nahêlim hûn kurê min derzî bikin.

Xezalê bi lava, bi qurban, bi heyran ancax Sînem serwext kir û wê bi dilekî kul hişt. Şêx Werda, gava ew yek dît, erinî û xwast here, lê Sînem li ber sekinî, jê lava kir, got:

– Dayikê, ez xweliya bin lingên te me! Min gunekarê çi kiriye, çira diçî? Bisekine, min tenê nehêle!

Lê Werdê guh neda wê, derî vekir û got:

– Êdî lingên min bi vê malê nakeve! Tu bêaqbet bimirî! Sînem, tu bi devê kûçikan herî! Tu dê li wê dinê di nava qîr û qetranê da biqicqicî! Tu bûyî sebebê ewladê xwe. Bi çêr û pêçarî derî girt û çû.

Gava Şêx Werda çû, çend jinên navsere jî dane pey wê û derketin, çûn. Di malê da Xezal, Zeynebê, kulfetê mala Hemîd û çend kulfetên mayin mabûn. Xezal heta sibê li ber lawik rûnişt. Derzî li ser derziyê lê xist. Kompris kir, bi zorê devê wî vekir, derman dayê. Serê sibê şeveqê ji cînaran tirê Erfût êdî mirye, lê na. Erfûtî sax bûbû. Rojtira mayin Xezalê ew guhaste nexweşxaneya gund.

Erfût deh rojan di nexweşxaneyê da ma û sax bû. Wê çaxê êdî navê Xezalê wek doktoreka baş di nav gund da bela bû. Dê û bavê Erfût nizanîbûn çi bikirina, ku ji bin qenciya Xezalê derkevin.

Di muayenexana ku Xezal tê da dixebitî da gelek nexweş hebûn. Ew bi dor diçûne bal û bi eşq û şayî derdiketin. Te dê bigota ew nexweş di nav çend deqeyan da sax dibûn. Wextê ku nexweş derdiketin, herkesî ji hindava xwe va pesnê Xezalê dida.

Di wê demê da derê doktorxanê vebû, xortekî bejinbilind û çavreş ji derda hat. Selam da gişkan û rûnişt. Wî kesekî nas nedikir û ji aliyê tu kesekî ve jî nedihate naskirin. Qet xeber nedida, lê dibihîst ku xelk di derheqa Xezalê da çi dibêje. Wî qelûn li ser qelûnê dikişand û li derî dinhêrî, pirtepirta dilê wî bû. Wî bawer nedikir ê Xezala xwe ya bi evîn bibîne û pê ra xeberde. Kî ku ji bal Xezalê derdiket, wî xweziya xwe bi çavên wan dianî, dikir rabe here bal, lê şerm dikir û nedixwest xebata Xezalê bisekinîne. Lê êdî sebir nekir, rabû hinek li piya sekinî careke mayin rûnişt. Dilê wî qaîm lêdixist, rûyê wî sor dibûn. Jinek ji hundir derket û xort çû hundir. Xezal xeftanê çilqerqaşî lê, li ber masê rûniştî bû, bi lez dinvîsî. Wê serê xwe ji ber xwe dernexist.

Gava xort derî nerm vekir û ket hundir, sar bû. Li ber derî sekinî, nikarîbû tiştek bigota. Ji çavên xwe bawar nedikir. Gelo ya ku li ber masê rûniştî bû, Xezal bû yan jî wî xewn didît?

Paşê wî hêdîka navê Xezalê hilda. Xezalê ku navê xwe bihîst, serê xwe hilda û li wî nihêrî. Gava ku wê xort dît, weka ku ji jor ve bi ser serê wê ve risasê birijînin heta binê lingan. Ew ji cî heliqî, lê xwe zeft kir. Wê ji bawar nedikir, herdu destên xwe danî ser çavên xwe, lê hingê ew xort nêzîkî wê bû, herdu destên wê ji ser çavên wê hildan û ew ramûsa, got:

–Delalya min, gula ber bîna min, Xezala min tu bawar nakî? Ez im, binihêre, netirse, xewn nîn e, rast e, şêrîna min!

Dema Xezalê van gotinan bihîst, kire îskîn û li wî nihêrî, got:

– Ahmo, tu çawan hatî? Te qet ji min ra van rojan name jî nedişand. Ez zaf difikirîm. Min digot, dibe tu bêkêf bî, lê baş e, şikir tu sax û silamet î û va li bal min î.

Ahmo bi ken jê ra got, ku ji qestî jê ra name neşandiye, lew xwestiye bi xapexap here, da ew nizanîbe. Paşê wî got, ku dê û bavê wî jî hatine, li mala bavê Xezalê ne.

Xezalê ji kêfa nizanîbû çi bikira. Ahmo li wê dinihêrî, wê jî li wî... Ew wisan qederekî kerr û lal sekinîn. Te dê bigota dixwazin heyfa xwe ya çendeyekî hildin. Lê na, herçiqas li hev dinihêrîn jî, ji hevdû têr nedibûn.

Ahmo bala xwe dayê ku nexweş derî vedikin û digirin, gote Xezalê:

– De bi xatirê te, ez ê herim malê û bêsebir çavnihêriya te bikim.

Xezalê ew heta ber derî bi rê kir û jê pirsî gelo ê dê û bavê wî tiştekî nebêjin, lew ew servekirî bû. Ahmo keniya û gote Xezalê:

– Xezal, şerm e, gotinên wisan nebêje. Dê û bavê min ewqas jî paşdamayî nîn in.

Ahmo, dê û bavê wî du rojan li Elegezê man. Wan hema roja pêşîn Xezal nîşan kiribû û rojtira dinê dixwestin vegeriyana malê, lê mala bavê Xezalê nehiştin. Wan rûmeteke mezin ji wan ra girt. Paşê, rojtira mayîn ew bi rê kirin.

Dê û bavê Ahmo dixwestin çend mehên din şûnda Xezal bibirana. Ew pevketin, heta havînê piştî gihadirûnê.

Ahmo zaf bêsebir li hêviya hatina havînê bû, lê wisan zû wext derbas bû, ku ew jî zendegirtî ma. Mala wan êdî karê dewetê dikir. Wan êdî xwençeyên xwe digerandin, kar û tedarekê vexwendiyan didîtin. Mala bavê Xezalê jî, ji wan şûnda nedima. Xezal û bavê wê çend rojan çûne Erêvanê. Ji bona cihêz çi ji wan re lazim bû, kirîn û vegeriyane malê. Gava Xezal û Mecîd hatin, çend cîna-

rên wan di malda bûn, dîtin, ku çiqas hûrûmûr, kinc, rihel ji Xezalê ra kirîne. Cînar zendegirtî, şaş bûn. Surmê, cînara wan di cîh da nêzîkî wan bû, got:

– Ê..., Mecîd birê min, tu dibêjî, ku te qelen nestendiye, lê çima te ewqas tişt kiriye? Ez bi serê kurê we kim, birê Mecîd, tu zulmê dikî! Meriv rabe qîzê bê qelen bide xelkê û di serda jî malekê pê ra dayne? Na, qurban tu carî wisan nabe. Tu bi vî awayî bi hurmeta qîza xwe dileyizî, tu qîza xwe sivik dikî. Qîza bê qelen bê rûmet e, birê min! Tu çawan ji Xwedê natirsî û qîzeke nolî Xezalê bê qelen didî? Tu were guh bide xuşka xwe, ez ji te ra bêjim. Ev gilî, giliyê bav û kalên me ye: "Carekê, yekî qîzeke bê qelen xwest. Wextê qîzê siyar dikin, dibin; bi rê va dixwazin ji çemekî derbas bibin. Bûk li ser hespê bûye, av lê dixe û hindik dimîne li ber pêlan here, di wê demê da meriv digihîjinê, ku xelas bikin, lê xezûrê wê dike gazî, dibê: "Hespê min xelas bikin! Hespê min...cehnima bûkê, ew bê pere ye !". Gava bûk van gotinan seh dike, kerr û lal vedigere mala bavê xwe û dibêje: "Ez bê qelen ew naçim!" Gava qelen tînin û bûka xwe dîsan dibin, xezûrê wê ew terk nake, timî hay jê dimîne. Wextê digihîjine çem xezûr dike gazî: "Wî... gidîno, ez ketime bextê we li bûka min miqate bin". Aha birê min, bûka bê pere, bê rûmet e jî...

Gava Mecîd ev gotin bihîstin, pirr aciz bû, hêrs hatinê, lê xwe zeft kir û got:

– Xuşkê, ew zeman êdî çûn, zemanê qelenê qilêrî çû, ez niha tu carî nikarim qîza xwe bi qelen bidim. Li gor gotinên te gereke min Xezalê bi peretî bida, paşê jê re cihêz bikiriya? Min ê bi çi dilî hebûna wê mala ku qîza min ê herê talan bikira? Min ê qîza xwe bişanda ser maleke req û rût? Paşê ez ê bi çi rûyî biçûma mala wê, min ê çawan li mêrê wê binhêriya? Ez ê bi çi rûyê li qîza xwe binhêrim? Ma ev qîz dê nebêje, gelo ev bav bû yan tucarê merivan

bû, mala mêrê min talan kir û ez paşê dame wî. Na, xuşka Surmê, bi texmîna min, min zaf baş kriye, bila li hev pîroz û mubarek bin. Bila herdu ji hev ra baş bin, ew ji min ra hêjaye malê dinê.

Çend cînar bi gotinên Mecîd razî bûn. Lê Xezal rûniştibû, bêdeng li wan guhdarî dikir.

Rojeke havînê yî xweş bû, ber derê mala bavê Xezalê tijî bibûn. Qîz û xort ketibûne govendê û bi deng dilîstin. Gund û gundî li hêvîya mala zavê bûn, li hêvîya vexwendiyan. Dê û bavê Xezalê jî ketibûne boçikê û dilîstin. Lê Xezal û Karê di mal da li rex hev rûniştibûn. Şêrîn, şêrîn bi hev ra xeber didan. Hev hemêz kiribûn û rûniştibûn. Di wê demê de, ji derva deng gihişte hundur, "hatin". Xezal û Karê rabûn. Wan wê şevê tenê li hev dinehêrî. Xezal sor bûbû, bi ser sûretê hinarîn da hêsir dibarîn, lê Karê henek kirin û bezî derva, ku rastiyê hîn be. Gava ew derkete derva, bala xwe dayê hewş bi gundiyan kimkimî bû. Te derzî biavîta nedikete erdê. Karê ancax ji nav wan derket û sekinî. Dixwest riya Êrêvanê bihata kivşê. Wê nihêrî û dilê wê avît, çend otobosan nêzîkayî li gund dikirin. Ji dûr va dengê def, zirne û kilaman dihat. Karê dîna xwe da otobosan û texmîn nekir, ku merivek bi lez û bez di ber wê ra derbas bû.

Wê ji pişt xwe va dengê ken û qerebalixiyê seh kir û ber bi malê ve çû. Gava ew gihişte malê ecêbmayî ma. Çend xort û qîz di dora xortekî de diçûn û dihatin, wan dixwest avê bi serda bikin, lê wî xwe danetanî; wek "rûvî" bû. Ew hevalê Xezalê û Ahmo Kolya bû. Di wê demê da Xezal derketibû derve. Gava wê Kolya dît, ber bi wî çû, selam dayê û ew bire malê, lê pişt û serçavê wî di avê da mabûn. Karê jî di pey wan de çû malê. Xezalê ew bi Kolya da naskirin û ji bo ku Kolya kincên xwe biguhêze Xezal û Karê çûne otaxa dinê. Di wê demê de bû girmegirma def û zurnê û qêrîna otobosan. Berbû ji otobosan peyabûn û ketine govendê.

Paşê çûn bal bûkê. Xezal û Karê di odeya jorîn da bûn. Berbû çûne bal wan. Xezalê di nav berbûyan da Sêvê naskir, heta wê kir ber pê here, ha dît Sêvê di hemêza wê da ye. Wê Xezal radimûsa û dor nedida wê. Paşê Xezal berda, ber bi Karê çû.

Gundiyan haziriya xwe dîtibûn û ew li hêviya vexwendiyan bûn. Nîvro, gundiyên ku karê xwe kiribûn, nêzîkî wan bûn, ew birne malên xwe. Heta êvarê te derê kîjan malê vedikir kêf bû ê şayî bû.

Êvarê, li ber derê Mecîd govend giran bûbû. Bi def û zirne diçûne pey goxwendgêriyan. Gava govend rind giran bû, Qaçax rabû sedbanknotek da defvan; Xezal, Karê û Sêvê kirne sergovendiyê. Sêvê wisan rind sêpê dilîst hewesa meriv dianî, lê Qaçax li Xezalê dinihêrî û qelûn li ser qelûnê dikişand. Heta nîvê şevê tevahiya gundiyan wisan lîstin, kêf kirin. Lê ji ber ku dê wê sibehê Xezal zû siwar bikirana, dewet belav bû, da berbûrî hinekî hêsan bin. Ji bona sibê bikaribin di riya dûr de biqedînin.

Berbanga sibê bû, berbûrî gişk êdî hazir bûn, li ber derê mala Mecîd bûn. Girmegirma def û zirnê bû. Li ber derî texte rast kiribûn, kêf dikirin. Şa dibûn. Wan heta du- sê saetan wisan kêf kir, paşê bavê Ahmo ji eşqa mala bavê Xezalê, ji eşqa dê û bavê wê vexwar û gote Mecîd:

– Mecîd, birê min, pismamê min, ez ji birê xwe zaf razî me. Tu timî wa serfîraz û rûspbî bî! Herweha cînar û merivên te jî. Ez ji gundiyan jî zaf razî me, yên ku îro du roj in ewqas zehmet kişandin û ewqas bi qedir û qîmet bûn. De gelî bira û pismaman, ev weha hatiye û çûye; destûra me bidim, em bûka xwe bibin? Wî kasa xwe vexwar.

Mecîd jî bi gundiyan va razîbûna xwe dane wan û destûra bûkê dan. Cihêzê Xezalê kirne otobosê, tê da bi cîh kirin. Paşê bi def û zirne ew ji malê derxistin. Sêvê ketibû milê wê, Ahmo jî li pey wan

diçû. Xezal û diya xwe digiriyan. Wê dê û bavê xwe ramûsa, xatir ji heval û hogirên xwe xwest, li otobosê siyar bû û otobos bi rêket...

Xezalê kire îskeîsk. Dema Ahmo ev yek dît, bi destê wê girt, nerm givaşt û got:

– Ezîza min, ma meriv di rojeke wisan de digrî?

Ahmo destmalka xwe derxist, hêsirên wê paqij kir. Xezalê li wî nihêrî, paşê Sêvê ku li kêleka wê rûniştîbû û kerr sekinîbû serê xwe kire ber xwe.

Di nava çend saetan da bi eşq û kêf gihîştine nehya Artaşatê. Li wir komek kur û qîz hatine pêşiya wan. Berî tevan zûtir, Belga diya Ahmo gihîşte bûka xwe û eniya wê maçî kir û li ber wê reqisî, ew bire malê.

Sê rojan temamiya gundiyan dawet kirin û bi kêf û eşq şaya Ahmo û Xezalê kirin.

Piştî dewetê Ahmo û Xezal çûne nava bax, di bin dareke zerdelê yeka hêşîn da sekinîn; bîstikekê li nav şavên hev nihêrîn û keniyan...

## REVA RIHANÊ

1

Zivistan bû, zivistaneke sar. Berf qasî bejnekê ketibû. Derî û kulek xitimandibûn, vizîna bê bû. Bayê ku bagerek rakiribû, fizildûmanek wisan kiribû, çavên meriv dorberê xwe nedidîtin. Ew bagera di orta Xaç û Xidirnebû da bû. Gundiyên gundê Segerê ji şeveqê va rabûbûn, berfa ber derên xwe, ya ser xaniyên xwe paqij dikirin. Îro gişk bi rojî bûn. Êdî rojiya paşîn bû. Sibetirê gere eyd bûya, loma jî gişkan ber deriyên xwe temîz dikirin; ne dê meriv bihatana malên wan û eyda wan bimbarek bikirana. Piştî kar qîzên gihîştî diciviyan, totêkên şor dipehtin. Di mala Hesenê Pîrê da jî totika şor dipehtin. Ew çar qîzên bermiraz bûn, çar heval: Beso, Zozan, Almast û Rihan, qîza wê malê.

Di dilê her yekê da niyetek hebû: Gelo di xewnê da dê kî av bida wan. Wan gazî Xwedê dikir da zû bibe êvar, ku qursikan bixwin, razên û hezkiriyên xwe di xewnê da bibînin.

Almastê got:

– Rihan, rast bêje, tu dixwazî kî di xewnê da avê bide te?

Lê Beso bi henek got:

– Almast, tu çiqas bêfehm î! Kî nizane Rihan Mirad dixwaze, ew dixwaze Miradê şivan avê bide wê. Ew û Rihanê ji zû da çav berdane hev. Gava ew çav bi wî dikeve, tu dê bêjî ruhê wê teze dibe, dinya wê ronahî dibe.

Rihan sor bû, lê rindtir bû. Herdu dêmên wê mîna gulan sor bûn, bûne mîna xaşxaşkê

Zozanê got:.

– De Rihan şerm neke, çira tu sor bûyî? Em gişk jî bengî ne. Mesela ez bi dil dixwazim, ku Sûto bê xewna min, avê bide min.

Beso got:

– De qîzino bes e, werin rûnin, êdî dereng e, fitar bikin, ku hûn paşê dîwaran binexşînin: "Arvanê Xidirnebî" eleg bikin.

Qîz rabûn, her yek çû mala xwe. Wan soz dane hev, ku şeveqê li mala Hesen bicivin û ji hev ra bêjin ka kê çi xewin dîtiye.

Rihanê piştî fitarê xwe xemiland û dest pê kir ku navmalê bi arvan binexişîne. Wê li ser dîwaran qilafetên kulfetê malê gişka çêkirin, paşê qilafetên pez û yê dewêr çêkir. Di dawiyê de xêlî avîte ser serê xwe û arê "Xidirnebî" eleg kir, danî ser sitêr, şarekê avîte ser û got:

– Dayê ez zaf tî me, firek av venexum, tu çi dibêjî?

Diya wê got:

– Na, qîza min, heta niha te di ber xwe daye, hinekî din jî di ber xwe bide. Rabe totika xwe bixwe û razê.

Rihan rabû çû totikê anî, ancax hinek xwar. Keriyê din xist bin balgiyê xwe û raza. Şeveqê çav da ew û diya xwe rabûn, tendûr dadan, savar avîtinê, ew der dane hev û rûniştin. Rihanê madekirî bû. Diya wê jê pirsî ku çi bûye, wê ji diya xwe ra negot. Di wê saetê de hevalêd wê hatin. Ew ji mal derketin, çûne derve û xewnên xwe ji hev ra gotin.

Zozanê bi eşq got ku çawan Sûto bi şerbikekî mezin av daye wê. Beso û Almastê jî bi dilekî şa xewnên xwe gotin. Lê Rihan melûl bû. Pêşî hevalan ji şabûna ew yek texmîn nekiribûn. Lê gava dora Rihanê hat, wan teze texmîn kir ku hevala wan bêkêf e.

Almastê jê pirsî, got:

– Rihan, çi bûye? Ma te yekî din di xewna xwe da dîtiye?

Rihanê serê xwe hejand, dixwest bigota"na".

Got:

– Ax, nizam ew çi xewn bû min dît. Heta niha jî ew mar li ber çavên min e. Marekî xwe li stûyê Mirad pêçabû û nehişt ew avê bide min.

Rihanê wisan got û kesereka kûr kişand.

Qîzikan li çavên hev nihêrîn, melûl bûn û ji Rihanê hêvî kirin, ku xewna xwe ji wan re şirove bike. Wê got:

– Min di xew da dît, ku ez zaf tî me. Li tu cîhî av tunebû, min dikire qajîn, qêrîn. Tu kes tunebû, ez di nav deşteke mezin da tenê bûm. Ez li ber zinarekî rûniştim û giriyam. Min nihêrî ji nişka va Mirad derket. Cêrek tijî av di dest da bû. Pêşî min şerm kir, bi paş va vekişiyam. Min lê nihêr ew dikeniya û ber bi min dihat. Cêrê avê dirêjî min dikir. Hingê ez ber bi wî çûm, gava min dest avête cêr, ji nişka va, ji pişt zinêr marekî mezin derket û li lingê Mirad aliya. Min kire qîjîn... Cêr ji destê min ket, duperçeyî bû. Mar ji lingan hetanî qefesê li Mirad aliyabû. Min kire qêrîn, ez ber bi Mirad çûm, ez bi qêrîna xwe şiyar bûm. Min nihêrî ku xewn e.

Qîzikan gişka lêvên xwe gez kirin û gotin:

– Xwedê bide xatirê navê xwe! Mirad gune ye, tayê bi tenê ye û wisan melûl çûne malê. Êdî cînar hatibûn, tijî bûbûn ji bo bi hev ra biçne mala Seydo Axa; tev jê ditirsiyan.

Gava ber bi mala Seydo Axa çûn êdî sibe ronahî bûbû. Ji dûrv va, ji mala wî dengê def û zirnê, dengê ken û xeberdanê dihat. Gundiyên feqîr li ber derî sekinîbûn, bizav nedikirin herne hundir, lew vê carê pêşkêşa wan hindik bû; pezek tenê bû.

Ew ditirsiyan, ku Seydo Axa razî nebe û ji paş va bide û ji wan bixeyde. Di nav wan da Qasim hinekî bi bizav bû, ew pêşî çû û got:

– Mala we ava be, li pey min werin! Çima bixeyde, çiqas eyd e em xelatan jê ra tînin, ji devê kulfetê xwe dibirin, didine wî... Vê carê jî qeweta me ancax gihîşte miykê. Careke mayin em dê tiştekî

qenctir bînin. Hinekî din jî bi pêş va çûn. Eyda Seydo Axa û ya kurê wî bimbarek kirin û kerrekerr bi paşva vegeriyan. Gava derketin derve bîhneke azad kişandin. Gundiyekî got:

– Şikir vê carê dengê xwe nekir, hinek serxweş bû!

2

Di ser rojên"Xidirnebî" ra du– sê meh derbas bûbûn, lê Rihanê nikaribû xewna xwe ji bîr kira. Ji wê rojê û pê ve bi dilê kul, bi çavên hêsir li çiyan, li baniyan, li ber berx û karan bû. Gelekî ji pez hes dikir, lê ji bextê wê ra pezê mala bavê wê hindik bû: çar mî û beranek... Çiqas roj bû ew diçû ji wan ra giha dianî û li bal wan rûdinişt û alif dida wan. Wê derdê xwe ji pez ra digot. Pezê ku li ber destê Mirad bûn. Wê, ew miz didan, çavên wan maçî dikir, çavên wê tijî dibûn, bi dilekî kul digiriya. Ji wan ra digot:

– Ax, hûn heywanetên bê zar û ziman, hûn evîna dilan qet fêm nakin? Hûn pirs nakin gelo ez ji bo çi wa kerr û lal digrîm? Hûn qet pê dernaxin çima ez we timî maçî dikim, ne hûn herroj wî dibînin. Ax... Hûn nikarin... bêjine wî kula dilê min giran e.

Rojekê Rihan bi Almastê û Beso re gîha li pişta wan e, diçine malê. Wan xeberdida, dikenyan lê Rihan melûl bû. Hevalan jê pirsî, gotin:

– Rihan, tu çima melûl î, çi bûye?

Wê got:

– Ma hûn nizanin çi bûye? Ev çend roj in diya min nexweş e, lê îro zaf tal e. Dinya li serê min bûye doje.

Beso berê xwe dayê û got:

– Tişt nabe Rihan, sebir bike, Xwedê rehîm e, çi ditirsî, kî nexweş nakeve, diya te tim jî dikeve şikir zû baş dibe.

Rihanê got:

– Na, vê carê mîna hercar nîn e, tiştekî naxwe û bi zor diaxive.

Wisan bi xeberdan gihîştine ber derê Seydo Axa, ku nêzîkî mala Hesen bû. Casimê kurê Axê li ber derî sekinî bû. Wî ji serî heta lingan li qîzikan nihêrî û bi dengekî bilind got:

– Roja we bi xêr, qîzino! Hûn çiqas bi lez in? Hûn selamê jî nadin meriv? Hûn ji ku tên ha?

Almastê got:

– Em ji ku tên? Ma tu nabînî ku em ji pez ra gîha tînin? Û bi lez çû.

Casim got:

– De baş e, qîzika delal! Wisan tê kivşê ku tu lingên xwe pirr li guhên xwa dixî, ez dê ji heqê te bême der. Lê heyf... Rihan bi te ra ye... Yan na min tu wisan rehet bernedida! Û çû malê.

Rihan êdî gihîştibû malê, li bal pez gelek nesekinî, bi lez gîha û av da wan û çû hundir; ber bi diya xwe va ya nexweş.

Xezê di nav ciya da bû, li ser piştê dirêjkirî, çavên wê girtî hûn. xwîdanê zîpik zîpik di eniya wê da dabûn der. Rihanê qasekî lê nihêrî û kir ku here. Jê weye diya wê razaye. Xezê çavên xwe vekirin, li qîza xwe nihêrî, got:

– Rihan, emrê min, were li kêleka min rûne, ez têr te bibînim! Dibe êdî te nebînim... Ax... min çiqas dixwest daweta te bidîta, mîna ya xuşk û birayê te, paşê bimrama... Niha ez nizanim tu dê kî bistînî, bextê te dê çawan be. Yê Seyrana xuşka te û Kinoyê birê te dizanim; bi pirrî bi hindikî ji xwe ra dijîn. Ax... qîza min ya herî heskirî dê bextê te çawan be? Tu dê bê min çi bikî? Tiştekî tenê, keça min, xebera diya xwe di bîr bîne, timî li gor bavê xwe be, ji gotina wî derneyê.

Ev gotin mîna tîreke tûj di dilê Rihanê da diçûn û dilê wê yê birîndar pirrtir dişewitand. Wê nizanîbû çi bêje, dilê wê dişewitî, agir û alav pê ketibû, hêsrên mîna taviyên teyrokê ji çavên wê yên reş dibariyan. Xwe avîte ser cîhê diya xwe, got:

– Dayê, tu çima tiştên wisan dibêjî, tu hertim jî weha nexweş diketî, tu dê sax bibî, ji bo xwe tiştên were nebêje.

Xezê kire nalîn û got:

– Na, qîza min, rast e, ez hertim jî nexweş ketime, lê vê carê ez nikarim... Bîhna min diçike. Ez êdî dizanim, ku ez ê...

Di wextê xeberdana dê û qîzê de Kino û Seyranê jî hatin cem diya xwe. Ew li Sengerêda diman.

Gava Xezê ew jî dîtin madê wê xweş bû, got:

– Şikir ji vê rojê ra! Hûn hatin? Koma min li ser hev e, ez niha dikarim rehet bimirim.

Kino û Seyranê xwe avîtine ser ciyê diya xwe û maçî kirin, gotin:

– Dayê, twisan nebêje, em bêî te ji çira ne?

Xezê got:

– Na, ez dê bimirim, lê heyf min nedît gelo dê bextê Rihana min çawan be. Kino, tu û Seyran êdî mezin in, guhê we li ser Rihanê be!

Wan weha gelekî bi hev ra xeberdan, paşê çûne malê, bal Hesen. Dîsan Rihan tenê li bal diya xwe ma. Ew gelek rûnişt. Ji şevê gelek derbas bûbû, Xezê êdî temişî bû. Rihan rabû, lehêfa wê berda û çû ku ew jî hinek razê.

Rast e ew çû ku rehet razê, lê fikra wê tim li bal diya wê bû. Hema bi kincan va pal da, lê nikarbû razê, li ser gotinên diya xwe difikirî. Ber çavên wê dibû mij, dîsan difikirî, çira diya wê ew xeber gotibûn? Gelo dibe diya wê rast digot dê ew... Ax..., na, na, diya min dê pak be. Wê di ber dilê xwe dida. Ew nikare min tenê, situxar bihêle, na, ew ji xwe ra dibêje, lew vê carê hinek xedar e.

Bi vê fikrê, ew di xew ra çû. Wê çaxê Hesen hatibû bal Xezê, pirsî, got:

– Xezê, tu çawan î? Ez li bextê te me, me ziravqetyayî neke, te

zaro tirsandine. Seyran û Kino hatin bal min gelekî melûl bûn, nedixwestin razên. Min ew bi zorê şandin, ku hinek razên. Lê Rihan jî roja tu nexweş î heta niha diçe– tê, tu dê bêjî serjêkirî ye. Ne xeber dide, ne ken bi dev dikeve.

Xezê got:

– Ax..., Hesen, min zaf dixwest, ku ez nemirama, min bidîta Rihana min bextewar e, lê çi bikim, vê carê ez zaf xirab im... Mêrê wê got:

– Xezê, de bes e, hinek di ber xwe bide! Ez dê ji te ra tiştekî bibêjim, lê tu niha ji Rihanê ra nebêjî. Tu dê gelek pê şa bî, gava bibihîzî. Rihana me dê bextewar be, îro min gotineke weha bihîst: Casimê kurê Seydo Axa, Rihana me dixweze, lê dê û bavê wî naxwazin; dibên "Kurê axê nikare qîza kesîban bistîne". Lê Casim dibê: "Xeyn ji Rihanê ez tu qîzên mayîn nahebînim". Ev mehek e dê û bavê wî bi zimanekî xweş li ber digerin, dikin nakin pê nikarin. Bavê wî tirs lê firandiye. Casim ji diya xwe pir lava kiriye û dê zorê daye bavê wî û ew razîkiriye. Niha dê van rojan bêne mala me, Rihanê bixwazin.

Xezê got:

– Ax, Hesen, ez ne ku pê şa bûm kulên min bi hev ra rabûn. Ji alîkî va qenc e, maleke xweş e, dewlemend in, lê ji aliyê din va xerab e. Em jar in, ew dewlemend in, dê herroj bidine rûyê qîza min. Ji aliyekî va bi texmîna min Rihan wî naxwaze. Wê ji min ra negotye, lê ez tê derdixim, dilê wê bi Mirad va ye.

Mêrê wê bi hêrs got:

– Mirad? Jinik tu çi dibêjî? Mirad şivanê wan e. Ew axa ne qîza te dixwazin û tu neqayilî... Rihan tiştekî nizane, gava pê bihese dê gelek şa be; jinik, tu çi dibêjî?

Jinikê got:

– Hesan, ez dibêjim bila qîza me wî nestîne, kîjan belengazî ji

wan xêr dîtiye heta ku em bibînin? Wî di kur ra qîza min ya belengaz dît, lê dibe derew be, kî ji te ra got?

– Derew nîn e, Îbo ji min ra got, berdestiyê Casim yê ku bi şev û roj li mala wan e.

Xezê dîsan got:

– Ax, Hesen, min dixwest bi te ra gelek xeber bidim, lê êdî nikarim, taqet nakim. Ayyy... dilê min... ax, dê niha biteqe...ih... ih...çi...ih...ih...

Hesen bi destê wê girt, miz da, av dayê û heta berbanga sibê li ber livîna kulfeta xwe rûnişt.

Berbangê Hesen serê xwe danî da hinek razê. Xezê jî xayis ketibû. Hesen hişyar bû, dît ku Xezê rûniştiye, gazî Rihanê û zaroyan dikir.

Xezê got:

– Gunê wan li stûyê te...zû... ga...zî... ke....

Hesen çû hemiyan şiyar kir, Rihan, Seyran û Kino bi hev ra hatin, lê dereng mabûn... Xezê êdî li ser piştê ketibû, serê wê di ber da hatibû, çavên wê tenê vekirî bûn. Te dê bigota hişyar e, li riya wan dinhêre. Ji Rihanê weye diya wê li wan dinhêre, kire qîjîn.

– Dayê, ezîza min, çira wisan dinhêrî? Em hatine, binihêre, de bêje, te gazî me kiribû, de bêje...

Lê ew êdî tunebû... Seyranê, Kino û Hesen fêm kirin, ku Xezê êdî tune, mîna dînan xwe avêtine ser meytê wê, lê Rihanê teze femkir, wekî çi qewimî ye. Wê got:

– Ax, dayê, te çi kir, te çima ez tenê hiştim...

Ez dê ji kî ra bêjim "dayê"...

Cînar hatin, mal tije bû. Hinek bi wan re giriyan û hinekan jî di ber dilê wan da.

3

Sibe bû. Sibeyeka biharê ya hênik. Bihar çiqas xweş e, meha biharê ya pêşîn bû. Tu dê bêjî hemû qîz û xortên cahil di vê mehê da mîna gul vedibin, kêf dikin û şa dibin. Lê ew meha xweş ya ku Rihanê ji hemiyan bêhtir jê hes dikir, îsal nehatibû. Wê gelek dixwest mîna hercar here li çiya û baniyan bigere, binhêre, yên jê ra dikeniyan. Lê îsal, vê mehê tenê jê ra kul û derd anîbû.

Di pey mirina diya wê ra du– sê meh derbas bûbûn û Rihanê ji dilê kul ra gelek hêsir rijandibû ser sûretê mîna gula sor.

Tu carî bawer nedikir, ku ew bê dayik e û hertim diçû ser mezelê wê, li ber rûdinişt, çi derdê wê hebû jê ra gilî dikir. Wê kulîlk diçinîn, ezîz girêdidan, baq baq datanî ser mezelê dayika xwe, kelogirî dibû û digot: "Diya min ya ezîz, te ji kulîlkan gelek hes dikir. Ez dê ji te ra herroj bînim. Mîna hercar, lê ji bo ku neçilmisin ez dê wan bi hêsrên çavên xwe av bidim".

Bi vî awayî ew herroj dihat, kulîlkên teze dianî, gelek rûdinişt, digiriya; kela dilê wê dadiket û diçû.

Hercar merivek li pey wê dihat, lê wê nedidît çi kes e. Wî xwe ji wê vedişart. Wexta ku ew diçû dîsan dida pey, diçû heta gund. Ew jî wek Rihanê digirya, radibû bi dizîka diçû, xwe nîşanî wê nedida. Dilê Rihanê hîn şikestî bû û wî şerm dikir here balê û di derheqa kula di dilê xwe da pê ra xeberde. Ew xort Mirad bû, heskiriyê Rihanê.

Rojekê, mîna herroj Rihan dîsan kulîlk çinîne, melûl melûl serî di ber da, di riya xwe ya herroj da diçû. Deng û his ji tu ciyekî nedihat, tenê carina li ber lingên wê dibû xişexişa hêşînahî. Yan jî di ser serê wê ra dibû çîveçîva çivîkan, difiriyan. Rihanê serê xwe bilind dikir û li wan çivîkan dinhêrî. Di dilê xwe da digot: "Ev çiqas bextewar in, ne derdê wan heye ne jî kulên wan, azad in, bi kur

va bixwazin, diçin, çi bixwazin, dikin".

Di wê dema ku weha difikirî da dengek bihîst. Ji wê weye yekî bangî wê kir, yekî ji nêz va bang kir, Mirad bû. Mirad ber bi wê dihat.

Rihan di cîh da sekinî, çokên wê sist bûn, ber çavên wê reş bûn, dêmên sor bûne mîna gulên mihemedî, lêvên sor yên kaxezî nerm çûn û hatin, got:

Mirad...

Lê zêdetir nikaribû tiştekî din bigota. Mirad hêdî hêdî nêzîkî wê bû, got:

– Roja te bi xêr Rihan! Emrê min! Tu ji min nexeyde min êdî nikarîbû îdare bikira, derdên min ewqas pirr in min nikarbû tu bidîta û ji te ra bigota.

Rihanê got:

– Mirad, tu çi dibêjî? Bila derdên te tunebin, tu çima wisan dibêjî? Şikir diya te sax e, nexweş nîn e, halê te baş e, çi derd û kul in? Kulfetê mala we ne giran e, tu û diya tenê ne.

Mirad got:

– Ax.. Rihan, tu hîn zaro yî, tu nizanî çi di dilê min da ye. Tu cahileke wisan î... çawan bêjim? Çend sal berê, wextê me çavgirtinokê dileyist û te ji hemiyan pirrtir dixwest tev min bilîzî. Lê niha Rihan, ez ew zaro nîn im, raste min berê jî, ji te hes dikir. Me timî bi hev ra dilîst, lê niha cûrekî mayîn e, ez bi cûrekî din ji te hes dikim. Niha tu ji min ra hemû tişt î, tu dinya min ya ronahî yî, Rhan... Ronahiya çavên min, ez bê te nikarim bijîm! Timî dixwazim li bal te bim, bi te ra xeberdim û li te binihêrim. Di ser wê rojê ra çar meh derbas hûne, ji çaxa diya te ya rehmetî wefat kiriye, tu herroj têyî vir û ez jî bi te ra me. Ez nikarim te tenê bihêlim. Niha te derdê min fêm kir, kula min çi ye, Rihan? De tu ji bo çi bêdeng bûyî, xeberde?

Rihanê got:

– Ax... Mirad, niha ne wextê tiştên wisan e, dilê min hîn birîndar e! Ez nizanim çi dikim. Ez hay ji serê xwe tuneme. Diya min ez stûxwar kirim, niha di derheqa tiştên wisan da neaxive.

Rihanê wisan got û berbi mezelê diya xwe çû. Mirad jî li pey wê çû û hêdî gote Rihanê:

– Rihan, bibexşîne, delalya min, min şaşî kir, diviyabû min ji te ra negota, lê çawan bikim? Ez ne gunehkar im, dilê min yê birîndar gunehkar e, êdî min nikaribû îdare bikira. Na, Rihan ez nikarim bêî te îdare bikim. Divê tu tiştekî bêjî, Rihan!

Rihan bîstikekê sekinî heta Mirad nêzîkî wê bû, paşê got:

– Mirad, tu dixwazî ez bêjim? Tiştek ji destê min nayê. Ez çi dikarim bikim? Divê tu bêyî bal bavê min, pê ra xeberdî, ew dizane.

Mirad got:

– Rihan, bersiva te ev bû? Tu çawan wisan dibêjî, belkî bavê te, tu neda min, hingê ez dê çi bikim? Tu ya dilê xwe bêje, tu min dixwazî yan na? Lê ez dê bavê te serwext bikim.

Rihanê got:

– Mirad, wê yekê ji min pirs neke, ez çi bêjime te?

Rihanê wisan got û sor bû. Hingê Mirad fêm kir, ku Rihan şerm dike, naxwaze gotina rast jê ra bêje, lê çavên wê rastî digotin. Çavên rwê astiyê ji Mirad ra digotin, digotin ku ew ji Mirad hes dike. Ew jî wek wî nikare bêî wî bijî. Wê gelek caran ew di xew da dîtiye, li bal rûniştiye û bêî wî nikare biqedîne, lê nedigot. Nedigot ku ew jî, ji bo Mirad pirr caran giryaye. Mirad ev rewş gişk fêm kir, got:

– Rihan, wekî wisan e ez ê diya xwe û du meriyên din bişînim bal bavê te; bila niyeta wî bizanibin.

– Erê Mirad, wisan baştir e. Niha here, ez dixwazim tenê herim bal diya xwe, pê ra xeberdim. Here, nebaş e, hinek ê me bibînin.

Mirad çû, lê pirr dûr neket li ber tilmekî sekinî heta Rihan hat û pêra çû gund, lê nehişt ew bibîne da şerm neke.

4

Wê rojê li mala Hesen gelek meriv hebûn, ew xwezgîniyê Rihanê bûn. Tev şa dibûn, dikeniyan. Rihan û ḥevalên wê li odeyê rûniştibûn û xeber didan. Almastê got:

– Rihan, Seydo Axa hatiye, bavê te jî qayîl bûye, tu jî naxwazî dê çawan bibe? Gava Miradê belengaz pê bihese dê çi bike?

Zozanê li Rihanê nihêrî û got:

– Rihan ez herim bêjim wî, belkî tiştekî bike.

Almastê bi dilovanî got:

– Feqîrê Xwedê dê çi bike?

Rihanê li hevalên xwe nihêrî, demekê fikirî û got:

– Na, bila ew hîn jî nizanibe. Zozanê rast got:"Feqîro dê çi bike?" Ne dikare xeber bide, ne jî dikare şer bike. Di destê bavê min da bû, ku wî ez nedama wan nikaribûn tiştek bikirana. Min ewqas ji bavê xwe lava kir, ez giriyam, lê wî bi ya min nekir. Ax... diya min sax bûya wê bi ya min dikir. Wê dikariîbû bavê min serwext bikira. Bavê min dibêje: "Tu fêm nakî, tu dê bextewar bî. Ev dewletî ne, nav mala wan xweş e. Ez ji xeynî wî te nadim tu kesî. Diya te ya rehmetî jî digot, ku ez wisan bikim tu dê bextewar bibî. Tu sitûxwar nabî. Tu ji vî bextî baştir çi dixwazî. Tu zaro yî, ev îşê te nîn e. Ez bavê te me û ez te didime wî!" De bêjin? Ez piştî van xeberên bavê xwe çi bikim?

Rihan digiriya û ji wan ra digot.

Zozan rabû û got:

– Ax, ya Rebî em çima ewqas bedbext in, ewqas hêsîr û sitûxwar, kengê em ê jî bibine meriv? Me jî wek merivan hesab bikin û me bi dilê me bidine mêr?

Almastê got:

– Ê, Zozan te çi wenda kiriye, tu li çi digerî? Bavê min jî bi zorê ez ji bona çend qurûşan dame wî merivî, yê ku min jê hes nedikir. Lê hûn dizanin ev çiqas e ez di çi halî da me? Ez şev û roj digirîm. Lê bavê min ji xwe ra digere, kêf kêfa wî ye; ne xema wî ye ez di çi halê da me. Du mehên din şûnda dê min siyar bikin. Diya min ya feqîr gotê: "Kuro, tu çi dikî, ew kal e, layiqî Almastê nîn e, ew wî keftarî naxwaze". Lê bavê min ji ciyê xwe rabû û bi hêrs ji diya min ra got: "Qîzê, tu here karê xwe yê jinan bike, ev ne karê te ye, tu ji ku dizanî kî baş e, kî xerab e? Ez dizanim qîza xwe didime kî. Rast e, deh panzdeh salan ji Almastê mestir e, tiştek nabe. Mala mêrikî xweş e. Dewlemed e, çira te ne bihîstiye civat dibê: "Bike kala, bixwe mala, çi bikim ji xortên kundir vala!". Jinik de niha here ser çixwilê xwe, êdî di derheqa vê yekê da, ji min ra tiştekî nebêje. Min qîza xwe daye, çûye". Xwîşkino, bavê min jî weha got. Em dikarin çi bikin? Hersê heval rûniştin, ji halê hev ra giriyan. Piştî ku mêvanê mala Hesen belav bûn, Almastê di ber dilê Rihanê da, hinekî din jî rûnişt, paşê çû.

Gava hevalên Rihanê çûn, Hesen nêzîkî qîzikê bû û got:

– Ev dêlik in. Te çawan dixwest lingê xwe li bextekî weha bixista? Du- sê mehên din şûnda dê te bibin. Hingê tu dê bibînî ku bavê te çi qencî bi te kiriye ku bi ya te nekiriye. Niha aqilê xwe bicivîne serê xwe, ne fikire xelk dê bi te bikene, gava seh bikin tu kurê Seydo Axa naxwazî.

Rihanê xwe zeft nekir, kelogirî bû, got:

– Bavo, ez nikarim di nav mala wan da bimînim, ez hînî azadiyê bûme, ez dixwazim ji xwe ra bê xem bigerim. Lê mala wan mîna kele ye, kî dikevê êdî nikare jê derkeve.

Bavê wê got:

– Tişt nabe qîza min, tu dê berebere hîn bibî. Qet xeman neke.

Piştî vê yekê Rihanê dît bêmane ye, nikare bavê xwe serwext bike, ew hişt, derket û çû.

Serê şeveqê, piştî karê navmalê Rihan dîsan çû kulîlk çinîn, baq baq kirin û çû ser mezelê diya xwe da derd û kulên xwe jê ra bibêje û hebekî hêsa bibe. Ew vê carê gelekî li ber mezel rûnişt û giriya.

Rihanê digot û digiriya. Gava wê li pişt xwe dengê lingan bihîst, rabû piya û sekinî. Mîna hercar dîsan sor bû, lêvên narîn çûn û hatin. Lê gotin ji devê wê derneket. Çavên reş ku hercar ji şabûna dibiriqîn vê carê tije hêsir bûbûn, melûl melûl berjêr dinihêrîn.

Mirad li Rihanê dinihêrî, fêm kir ku Rihan vê carê bêkêf e, gelek melûl û dilşikestî bû. Wî bi tirs pirsî, got:

– Rihan, emrê min, tu çima îro bêkêf î? Çi qewimî ye, dibe ku xalê min Hesen nexweş be? Yan jî... De bêje, Rihan tu çima xeber nadî?

Rihan kerr bû, te dê bigota ew dengê Miradê şêrîn di xewnêda dibihîze. Wê nikaribû tiştek bigota, derdê xwe bigota. Wê nizanîbû çawan bêje da dilê Mirad neêşîne, lê wext kin bû. Wext tunebû, ku bifikire û çi jî bigota dê dilê Mirad bima, dilê wî dê biêşiya. Gava careka din dengê Mirad bihîst, Miradê ku li nav çavên wê dinihêrî, Rihanê êdî nikaribû xwe zeft bikira, kire axîn û bi girîn got:

– Mirad, here min ji bîr bike! Ji xwe ra qîzeka din bibîne, ewqas qîzên baş hene, layiqî te hene. Ez çi me, tu min dixwazî? Bavê min ez dame yekî din.

Mirad di cîh da sar bû, erd di bin da çû û hat, serî lê gêj bû, bi zorê xwe zeft kir, ku nekeve, got:

– Rihan, ev tu î ji min ra wisan dibêjî? Tu di nav du rojan da çawan hatî guhertin, te çawan ez ji bîr kirime? Bi min ra henekên wisan meke! Rihan, tu çima min dikujî, bêje çi bûye, axir me soz

da hev, min dê xwazgîniyên te bişanda, ev çawan qewimî ye?

Rihanê got:

– Ew kurê Seydo Axa ye, Mirad. Ew hatin bal bavê min û wî jî ez dame, bi rastî min gelek lava kir, lê lavayên min tiştek nekirin. Wî bi ya min nekir. Gustîlik kirine tiliya min. Mirad, ez ji wî hes nakim, lê ez çi bikim? Heke tu dikarî tiştekî bikî, bike. Min jî, xwe jî, ji vê zilmê xelas bike! Mirad, min azad bike!

Rihanê weha got û mîna teyrokên biharê ji çavên reş hêsir bi ser rûyê sor da bariyan.

Gava Mirad ev yek bihîst, pêlên dilê wî rabûn, xwest hemû axa û dewlemendên ku kul û derd xistine dilê jar û feqîran perçe perçe bike, wan ji rûbarê dinyayê bide hildan. Lê wî dikaribû çi bikira. Bi dilekî şikestî û melûl bersiva Rihanê da, got:

– Rihan, negirî û ne jî bifikire, ez dê tiştekî bikim, eseyî, lê niha nikarim bibêjim. Ez dê niha herim mal ji diya xwe ra bibêjim, paşê jî ji hevalên xwe ra bibêjim. Ez dê binihêrim çika çi dibêjin. Ku tu careke din hatî vir, ez dê bersivekê bidime te. Niha here malê, min ji te ra çi gotiye ji tu kesî ra nebêje. Nefikire, heta Miradê te sax be nahêle tu bibî jina Casim Axa! De here nazika min, heta ku ez bifikirim, ez dê ji te ra bêjim.

Rihanê got:

– Mirad, delaliyê min, tu heta dikarî zû bike. Li gor gotina bavê min dê daweta min zû bikin.

Mîna hercar Mirad li pey Rihanê hat heta perrê gund, paşê çû mala xwe bal diya xwe ya pîr. Ka ew dê çi bêje? Gava diya wî ew dît pêre pêre pê derxist, ku kurê wê bê kêf e yan jî tiştek qewimî ye. Ber bi wî çû, bi tirs jê pirsî:

Mirad, sihet û qeweta min, tu çima madekirî yî çi bûye, dibe tu nexweş bî, an hinekan kêfa te şikandine? De xeberde, kurê min, çi bûye, çi qewimî ye? De bêje, dibe ku ez bikaribim alîkariya te bi-

kim, de bêje perrên min?

Mirad bi dilekî kul çi hatiye serê wî, got:

– Dayê sebeb ev e, lew ez melûl im. De niha bêje, ez çi bikim, ez tu caran nahêlim, ku kurê axê Rihanê ji xwe ra bibe, dîl bike. Ev tişt piştî mirina min dibe. Dayê, tu çawan dibînî, te dinya pirr dîtiye, şîretekê li kurê xwe yê dilbikul bike. Ez çi bikim, çawan bikim, ku Rihan nebe xwarina wî kûçikî?

Dapîra Mirad piştî van giliyan sar bibû, herdu milên wê pê da daketibûn, got:

Mirad, kurê min, ez dizanim tu ji Rihanê pirr hes dikî, lê tu dê çawan bikî, ku hem wê hem xwe û hem jî dapîra xwe xelas bikî? Rihê min, tu dizanî tu ronahiya min î, ku tiştek bi te bê ez dê dîn bibim, bikevime çolê. Were bi ya diya xwe bike, li pey vê yekê neçe. Tu kî yî, kî li te dipirse? Tu şivanê wan î. Tu çiqas bi qewet bî jî tu kes nayê alîkariya te, qîzeke bila bibin, dev jê berde, lawê min.

Mirad nehişt ew zêde xeberde, rabû, ji hêrsan dilerizî, got:

Dayê, bes e! Van giliyan ji min ra nebêje. Em tev wek te difikirin, lew jî em hatine vê rojê. Çawan ez bi tenê me, kî ji te ra got ez bi tenê me? Pirraniya gundiyan ji rihsitînê xwe razî ne, lê ji Seydo Axa ne razî ne, tu çi dibêjî? Lê ew nizanin çawan ji heqê wî bêne der, ku yek qeweta xwe nîşan bide, dê hemî jî xwe bidine pişt wî. Vî Seydo Axayî mala xelkê xera kiriye.

Diya wî got:

– Delaliyê min, madem wisan e, Rihan ji te hes dike, sozê xwe bikine yek, mala xwe bihêlin û herin aliyê Tibîlîsê. Hingê tu kes nikare Rihana te ji te bistîne. Ez û tu, em dê li wir bixebitin û aboriya xwe bikin. Çend nasên min jî li wir hene.

Gava Mirad ev xeber bihîstin, di orta wî û esman da bihostek ma, got:

– Dayê, te tiştekî çiqas baş got. Ez dê niha herim bal hevalên xwe ka em dê kengê herin. Lê tu jî karê xwe bike, binhêre em çi tiştî bi xwe ra bibin. Her tiştî neyne. Tiştê ku ji me ra pirr lazim be wî bîne. De ez çûm da bêjime hevalên xwe.

Wî wisan got û ji malê derket...

5

Havîn bû. Qijeqija tavê bû, roj ketibû germa nîvro. Pez hatibû danê nîvro, lê sekinî bû, lew şivan bi tiştekî din va mijûl dibû. Mirad wê rojê li hêviya Rihanê bû, çika wê çi bigota dê razî bibûya an na. Ew sê roj bûn ku Mirad diçû bal mezelê diya wê ji sibê hetanî êvarê dima, lê ew nedihat. Mirad kete mitalan, gelo dixwaze Casim bistîne loma nayê? Wê rojê jî Rihan nehat. Roja çaran, ku Mirad bawer nedikir bihata, hat. Gava nola hercar dît, ku dîsan baqê kulîlkan di dest da ye û tê, bawer nekir. Rihanê dîsan melûl ber bi mezelê diya xwe diçû. Wê li Mirad nihêrî, gava Mirad dît ew dikene hinek rih pê da hat. Ew nêzîkî wî bû, got:

– Mirad tu çiqas şa yî, dibe te tiştek kiribe, ji min ra jî bêje. Ev çend roj in ez mirim, Kino û Seyran hatine, ji bo dawetê karê min dikin. Wan nedihişt ez werim ser mezelê diya xwe, digot: "Em dê bi tevahî herin", ancax îro min xwe ji wan dizî û ez hatim. Duh Seydo Axa hate mala me, got: "Ez dê bûka xwe zûtir bibim, çiqas zû be ewqas baştir e". Bavê min û birê min soz dan ku serê vê mehê dawetê bikin. Deh roj mane. Mirad, zû tiştekî bike, ez nikarim, ez dê xwe bikujim, lê naçim wê malê.

Mirad got:

– Rihan, tişt nabe. Rihana min, tu fikran neke, ez dê wisan bikin, ku tu bibî ya min.

Mirad çawan qerar girtibû, yeko yeko ji Rihanê ra got. Rihan ji şabûna giriya, xwe avête hemêza Mirad, got:

– Mirad, de zû min azad bike!

Dîsan ji kêfa giriya. Piştî hinek girîn sekinî. Mirad got:

– Rihan, pênc roj şûnda em dê herin.

Wi dixwest, ku Rihan tedareka xwe bike, bi şev ew dê li ber mala wan, li benda wî be û ew dê ji wir bi tevayî herine Tîbîlîsê.

Rihanê got:

– Belê Mirad, ez dê hazir bim û li hêviya te bim. Ez ditirsim, ku dê me bibînin. Ax, Mirad ez ji wî Casimî çiqas hes nakim. Ji min weye ew dijminê min yê herî xerab e. Tu zû min ji wî xelas bike, bibe bi kur va dibî bibe. Ez ya te me, bi kur va dibî, bibe. Civatê rast gotiye: "Bira dil bi dil be, bira tûrê parsê li mil be, bira ew jî binîqul be!". Bila em li bal hev bin, bila em tî bin, birçî bin.

Mirad got:

– Kulîlka min, ronahiya dinya min, tu rast dibêjî. Ez bimirim jî ez dê rehet bim, lew dizanim tu ji min hes dikî.

Mirad bi eşq van gotinan digot, lê Rihan ji şerma sor bû, şavên reş berjêr kir, li erdê nihêrî. Paşê serê xwe rakir, bi beşereke xweş li Mirad nihêrî, got:

– Mirad, ez dê êdî herim, hîn ku kesekî em nedîtine. Pênc rojên din şûnda ez dê li hêviya te bim.

Rihanê wisan got û ber bi mezelê diya xwe va çû.

Rihan ber bi malê diçû, bi rê va rastî Almastê hat. Bi tevayî, bi xeberdan çûne malê.

Li mal, Almastê jê pirsî ka Mirad pê hesiyaye an na. Rihanê ji Almastê ra got:

– Almast, me qerar girtiye an em dê bimirin yan jî bigihîjine mirazê xwe. Pênc rojên din şûnda ez dê pê ra herim. Hingê Seydo Axa çi dixwaze bila bike, ez êdî ji mirinê natirsim. Bila min bikuje, ne ez dê li bal Mirad bim! Li kêleka wî...

Gava Almastê ev yek bihîst hêsiran di çavên wê ra avîtin, got:

– Ax, Rihan çiqas baş e, Mirad şêr e, xweziya çend merivên din jî mîna wî bikirana êdî van axa ewqas rû nedistandin.

Rihanê got:

– Almast, lê ez zaf ditirsim. Ji min weye ew marê di xewna min da Casim e, ew çawan bike nahêle em bigihîjine mirazê xwe.

Almastê got:

– Rihan, wisan dîn dîn xeber nede, tu çi dibêjî, hûn dê wisan herin, ku ew qet we nebîne.

Rihanê got:

– Ez nizanim û naxwazim bifikirim jî, lê...

Herdu hevalan heta derengî bi hev ra xeberdan. Gava Almast çû Rihanê jê xwest, ku Zozanê û Beso bên ew wan jî bibîne.

6

Gundê Sengerêda gelek haziriya xwe dikir. Daweta kurê Seydo Axa nêzîk dibû. Mala bavê bûkê jî haziriya xwe dikirin; Seyran û Kino jî hatibûn malê. Kincên Rihanê kirîbûn, cihêzê wê hazir kiribûn. Hesen jî tevî çend cînaran pez serjê dikir. Kebaniyên cînaran hatibûn, li ser sêlê nan dipehtin. Di wê malê da herkesî karek dikir, hemiyan haziriya xwe dikir. Tev şa bûn û beşera wan xweş bû. Di wê malê da yeke tenê tu kar nedikir, difikirî û melûl sekinî bû.

Cînaran digotine wê:

– Rihan, tu çima melûl î? Delalê, bextekî baş hatiye ser te. Qet nefikire.

Li gor hinekan jî wê şerm dikir. Lê hinekan jî digot, “Ew ji şabûnê sewsî bûye”. Lê Rihanê tenê bi kula xwe dizanîbû. Ew tim difikirî, gelo dê êvarê çawan be, dê bikaribe di wextê xwe da here cîhê civanê xwe û Mirad yan na, dê bihêlin ew ji hundir derkeve? Wê mitala van tiştan dikir, dizanîbû riya wan girtiye û pirr zehmet

e. Wê dizanibû kurê Seydo Axa wan wisan bi hêsanî bernade. Hevalên wê hatibûne cem, lê nikaribûn li wir biaxiviyana. Cariya mala Seydo Axa ku ji bo alîkariyê hatibû şandin li wir sekinîbû. Wê guhên xwe li wan bel kiribû, guhdariya wan dikir. Zozanê ev yek texmîn kir û got:

– Rihan, me rê girtiye, em nahêlin kes derbas bibe, em nahêlin kar bikin. Rabe em herin odeyê. Wan wisan kir. Cariya Seydo Axa pêrepêre li pey wan çû û guhê xwe da ber derî. Wê çaxê qîzikan di derheqa Mirad da xeberdida. Almast çûbû mala wan pê hesiyabû ka Mirad çi kiriye dê kengê bê pey Rihanê. Almastê got:

– Ez çûm, Mirad bi eşq ber bi min va hat. Pirsa te kir û ez birime tewlê, hespê ku kiriye nîşanî min da, got ku ew dê nîvê şevê bê, di wexta ku tev razayî bin da. Tu hazir li hêviya wî be! Gava te dengê wî bihîst, bi nermî derkeve der. Kes pê nehese, ew tev di mal da ne, herkes bi tiştekî va mijûl e. De niha em dê herin êdî şev e. Tu jî karê xwe bike. Mirad digot: "Bila ji xeynî kincên xwe pêştir tiştekî hilnede". Wî hemû tiştên lazim hildaye.

Hevalên Rihanê ew hemêz kirin, hev maçî kirin û her çar bi ser hev da giriyan.

Beso dilûrand, bi girî got:

– Ax, Xwedê, ev çi zilm e, te aniye serê me? Çima dê Rihan ji me biqete, çima dê bi dilekî kul mala bavê xwe bihêle, biçe cîhekî xerîb?

Bi dilşewatî hevala xwe maçî kir. Zozanê jî got:

– Rihan, miqateyî xwe be, nefikire, xortekî mîna Mirad li piştа te ye. De bi xatirê te, hevala me ya ezîz. Em heta xweş bin, li rûbarî dinê bin te ji bîr nakin.

Zozanê wisan got, careke din jî hatin rûyên hev û çûn.

Pero xeberdanên wan tev seh nekir, ji ber çûn û hatina xelkê. Gelekan jî tişt ji Pero dixwestin û wê nikaribû baş guhên xwe bida

keçikan. Lê wê fêm kiribû ku Rihan dixwaze wê şevê tiştekî bike; bi lez çû mala Seydo Axa. Ew çû cem Casim, ku wê şandibû bal mala Rihan ka çi heye, çi tê xeberdan. Çaxê Pero çû li ber derî rastî Casm Axa hat. Casim bi çend hevalên xwe ra derdikete derva. Pero lezand ku xwe bigihîjîne Casim, lê xanima wê deng lê kir, got:

– Qîzê Pero, tu çima hatî, ne min tu şandibû, ku tu alîkariya wan bikî? Ew heta sibê karê xwe xelas nakin. Jina mezin di mal da tune. Zû here bigihîje wan!

Çiqas qudûm di çokên Pero da hebûn, lezand, lê ne ji bo here mala Hesen ji bo xwe bigihîjîne Casim. Tiştê ku bihîstiye jê ra bêje. Lê Casim çûbû, wê ew nedît. Pero fikirî, ku here ji xanima xwe ra bêje, lê dudilî bû. Wê û Casim li hev kiribûn dê Casim pere bida wê, lê Xanimê ev yek nedikir. Serê Pero wisan tevlihev ber bi mala Hesen va diçû, ji dûr va dengê Casim bihîst. Casim got:

– Pero, min tu dîtî, dibe te tiştek bihîstibe? Zû bêje, çi lazim be ez dê bidim te.

Pero got:

– Erê, Axayê min, heke tu dixwazî rastiyê bizanibî tiştek heye. Rihan diwaze îşev tişekî bike, lê çi ye ez nizanim. Wê bi hevalên xwe ra xeber dida, digiriya. Ji ber ku xelk pirr diçûn û dihatin min baş seh nekir, pirr hêdî xeber didan.

Casim çavên xwe cinoyî kirin, li Pero nihêrî û bi hêrs xeber da:

– Min dizanibû Rihan dixwaze îşev tiştekî bike, lê çi ye ez nizanim. Min tu ji bo vê yekê şande wir da tu bizanibî Rihan dixwaze çi bike? Ha ji te ra van peran, nesekine, zû here guhdarî bike. Binhêre ka Rihan çi dike, hema şika te çû ser tiştekî zû were ji min ra bêje.

Gava Pero pere dîtin, çav lê çirisîn, ken bi devê wê ket û bi lez çû.

Wexta Pero hat Rihan ketibû odê, kincên xwe hazir dikir. Gava Pero bi maniya şerbik hate odê, Rihan vegeriya lê nihêrî, dît ku Pero jî lê dinihêre. Pero bi teherekî wisan li Rihanê dinihêrî, te dê bigota dixwaze jê bipirse, "Ma tu dixwazî çi bikî? Xweziya min bizanîbûya tu dê îşev çi bikî"û ji bo vê yekê jî pere sitendibû Rihanê jî xwe bi xwe digot: "Gelo wê bi tiştekî dernexist, wê nedît ku min kincên xwe bi cîh dikirin?". Lê wan bi hev ra axaftin nekir, Pero çavên xwe li şerbik gerand, nedît ji odeyê derket û çû. Wê çaxê Rihan dîsan kete nav kincên xwe, çend heb helbijartin û yên din careke mayin kire qutiyê. Wê êdî karê xwe kiribû, lê hîn jê ra zû bû. Rihan derket, çû cem Seyranê û cînarên din, ku xwarin hazir dikirin. Paşê dîsan çû odeyê, rûnişt. Dilê wê lêdixist. Şev çiqas diçû ew nikaribû di cîhê xwe da rehet rûne; diçû û dihat. Carncarna guhê xwe dida ser yên malê, lê hîn kes ranezabû, diçûn û dihatin, kar dikirin. Rihanê fitilî li paş nihêrî, bala xwe dayê, ku wa Pero sekiniye û li wê dinihêre. Gava Pero dît, ku Rihan li wê dinihêre, got:

– Rihan, Seyran dibêje: "Bila bê nan bixwe" û çû.

Rihan kete nava xeyalan, "Çima ev jinika han li wê dinihêre, dibe ku bi ser hisan ketibe, ku zanibe gelo dê bêje?". Dil wê digot: "na". Gava wê dengê Seyranê bihîst û derket wisan difikirî. Seyranê got:

– Rihan, xwîşka min a şêrîn, tu çima naêyî xwarinê naxwî? Te tiştek nexwariye, were û hinek xwarin bixwe û razê; tu dê sibe zû rabî, lê em dê hîn jî rûnin.

Rihan bi van gotinan kêfxweş bû, şa bû ku here, got:

– Seyran, ez westiyayî me, lê xuyaye hûn dê heta dereng rûnin. Ez ciyê xwe li odê datînim, ew der hênik e.

Seyranê got:

– De tu dizanî, ku tu tenê netirsî here şêrîna min. Tu îşev mêva-

na me yî, çawan dixwazî wisan bike.

Rihan çû. Pero jî pê bi pê li pey wê çû. Rihanê ew nedîtibû, xwe bi xwe got: "Ax, Xwedê dê kengê bê? Ez êdî nikarim. Gava li pişt xwe fitilî, Pero dît, got: "Ax Pero, dê kengê sibe bê em herin?

Pero bi ken got:

– Xanima min, zaf lez neke, hindik ma. Tu tenê natirsî, ez bême bal te?

Gava Rihanê ev xeber bihîstin, çokên wê sist bûn, got:

– Na, na, Pero tu here alîkariya Seyranê bike, ew gune ye. Ew tenê ye, cînar dê niha herin, ez ê jî niha razêm.

Pero lêva xwe gez kir û çû navmalê. Tebatî pê nediket, hinek kar dikir, diçû guhê xwe dida ser derî, guhdarî dikir.

Êdî nîvê şevê bû, baran hûrik hûrik dibarî; şevereş bû. Şevereşeke wisan ku meriv tilî di çavên hev ra bikira, hev nedidît.

Maliyên mala Hesen gişk razayî bûn, tenê Rihan ranezabû. Gava wê çirpînek dibîhîst, dilê wê hildiavît; ber bi derî dîreviya. Di vê şevereşê û baranê da Pero jî ranezabû, li mala Hesen mabû; wan nehîştibû ku ew wê şevê here. Gava çirpînek dihat ew jî radibû, li çaraliyê xwe dinihêrî. Ber bi odeya Rihanê diçû, lê guhdarî dikir, paşê dîsan vedigeriya dihate nav ciyê xwe. Ew bi vî awayî çar– pênc caran rabû, li derdorê xwe nihêrî. Yên din gişk razayî bûn. Xirexira Hesen dinya hildabû. Wî wisan dikire xirîn, nedihişt ku Pero dengan bibihîze.

Rihanê sê caran dengekî mîna dengê çivîkan seh kir, wê dizanîbû ew Mirad e, yê hatiye ku wê azad bike. Lê ew dê çawan here ku kes wê nebîne. Dilê wê hildiavît, destên wê dilerizîn. Wê jî nizanîbû ka ji bo çi digirî; laşê wê diricifî. Hêdîka derî vekir, nihêrt ku kes tune bi pêş va hat. Wisan bi tirs bi pêş va hat, giha heta ber sivderê, li ber derî sekinî, li aliyê malê nihêrî. Birê wê, bavê wê û xwîşka wê li wir razayî bûn. Keserek hatê û derî vekir. Êdî ew li

derva bû û piştî çend deqeyên din jî dê bigihîje Mirad. Tu kes belê êdî tu kes nikarîbû wê ji Miradê wê bi dûr bixe, destên wan ji destên hev derxîne. Gava ew derket, baranê birîbû, heta nîvê şevê jî, ji bo wan ronahiya xwe zêdetir kiribû. Te dê bigota ew jî bi wan ra şa dibû. Hewa xweş û hênik bû. Rihan hêdî hêdî ber bi Mirad û hevalên wî çû, ew jî li hêviya wê sekinî bûn. Wan bi lez Rihanê hilda û wenda bûn. Di wê maweyê de Pero çû li odeya Rihanê nihêrî, lê dît ku Rihan ne di nav cîhê xwe da ye; bi lez ber bi mala Seydo Axa bazda. Hingê Mirad, Rihan dabû ber dilê xwe û bi lez ber bi aliyê mezelan va diçûn. Diya Mirad û hespa wan jî li hêviya wan bûn. Gava gihîştine cîhê civanê, diya Mirad Rihan da ber pêsîra xwe û ew maçî kir, got:

– Delaliya min, sehet û qeweta min, ez êdî namirim, min ev roj jî dît! Xwedê we bi hev ra kal û pîr bike!

Mirad û hevalên wî zû zû tiştên ku lazim bûn avîtine ser hespê û gotin, ku Rihan li hespê siwar bibe. Lê Rihanê ji wan lava kir, ku berê here ser mezelê diya xwe, xatir jê bixwaze.

Rihan û diya Mirad çûn ser mezelê diya Rihanê, lê Mirad li cem hevalên xwe li ber hespa xwe ma. Rihan çû ser mezelê diya xwe, maçî kir, got:

– Dayê, şêrîna min, bi xatirê te, tu qîza xwe gunehkar neke. Ji min nexeyide, ez bi kur va jî herim tu dê hertim bi min ra bî. Ezîza min...

Rihanê wisan got û careka din jî mezelê diya xwe maçî kir û ji mezel dûr ketin. Herdu gihîştine cem Mirad, Mirad zû zû Rihanê li hespê siwar kir, dikir ku ew jî li hespê siwar bibe dengê teqînekê ji nêz va hat. Rihanê kir nalîn û ji ser hespê kete ser milên Mirad. Rihanê bi tirs li Mirad nihêrî û got:

– Mirad, zû bireve, ew pê hesiyane, dê te bigirin, here!

Mirad li Rihanê nihêrî, dinya li serê wî bû doje. Gava ku pê he-

siya destên wî ji xwînê şil bûne, li diya xwe ya ku digiriya nihêrî û got:

– Dayê, zû paçekî bide min!

Diya wî paçek dayê. Wî ew paç li birîna Rihanê pêça û ew hemêz kir. Wisan bi sîngê xwe va guvaşt te dê bigota qey dibêje "Tu kes nikare ji min bistîne". Xwe di nav mezelan da veşartin, paşê derketin ser rê. Hevalên Mirad, Cimo û Misto gotin:

-Li wî alî çiyayek heye, em bi wir va herin; di wî çiyayî da gelek şikeft hene, em herin bi wir va, heta sibê".

Wisan jî kirin.

Mirad, Rihan dabû ser milên xwe û bi çiya va hildikişiya. Hevalên wî li pêş çûn, cîhekî xweş dîtin û ew birine wir. Hevalên Mirad çûn giya çinîn, anîn Rihan danîne ser. Rihan xayis ketibû, Mirad got:

– Rihan, delaliya min, bêje, kêdera te diêşe? De bi min ra beber bide, ma tu dixwazî ez dîn bibim, Rihan!

Hingê wê çavên xwe nerm vekirin, li Mirad nihêrî û dîsan girtin. Zelxoya diya Mirad pêra pêra pêsîra wê vekir, ciyê birînê tije pêsû kir û careke din girêda. Wê di ber dilê Mirad da, got:

– Şikir tiştek tune, Rihana min dê di çend rojan da baş bibe.

Hevalêd Mirad jî dilminî didane ber dilê wî, ku tiştekî tirsê tune, birîna wê zêde kûr nîn e. Bala xwe danê êdî dinya zelal dibe, gotin:

– Mirad, em dê niha herin gund, binihêrin ka çi heye, çi tune. Ew kî bûn êvarê bi pey me ketibûn? Êêvarê dîsan vegerin werin. Bila tenê Rihan hebekî baş be, wekî din tişt nabe.

Herdu hevalên Mirad çûn. Mirad ji kêleka Rihanê ranebû. Wî bi destê wê yê mîna berfê qerqaş girtibû, miz dida. Lê Rihan hay ji xwe tunebû, wê carina dikir axîn û careke din bêdeng dibû.

Sibe rind safî bûbû, tava piştî baranê dabû û bîhna behiştê keti-

bû wan derdoran.

Zelxo ji şikeftê derket, ku binihêre ka ew li kur in, gelo gundekî nêz tune, ku here ji Rihanê ra dermanekî, tiştekî bîne, lê wê tu gund nedît.

Gava Mirad dît, ku ew tenê li bal Rihanê maye, destên wê da ser çavên xwe, ramûsa û deng lê kir, got:

– Rihan, Rihan emrê min, Rihana min, şêrîna min, çavên xwe yên reş veke, bila dinya min dîsan ronahî bibe!

Rihanê çavên xwe vekirin, li Mirad nihêrî. Lê tenê lêvên wê çûn û hatin, got:

– Mirad, tu li vir î? Ax... Çi baş e, ku tu li kêleka min î, ez ê bimirim! Lê dîsan jî tiştek nabe. Mirin ji mala Seydo Axa baştir e. Mirad, delalê min, azaddarê min, tu li ber xwe nekeve, ez êdî li bal te me, ez ya te me, ku bimirim jî dizanim ez êdî ya te me. Ez dixwazim ji te re bibêjim, ez bi libalbûna te gelek kêfxweş im. Tiştek jê baştir tune, ku meriv li bal heskiriyê xwe be... Min wisan dixwest, lê mirazê min nîvçe hiştin.

Mirad got:

– Rihan, wisan nebêje, tu dê sax bibî, em dê tim li bal hev bin. Delala min, ez dê bêî te dîn bibim.

Hêsir bi ser sûretê wê da hatin.

Hingê Zelxo bi pincara destê xwe ve hat û bi eşq got:

– Mirad, tu êdî çu fikran neke, ez dê Rihana xwe sax bikim. Tu rabe ji min ra agir dade.

Wî agir dada. Bi dilekî melûl û dilşikstî. Zelxo di şerbikê xwe da pincar keland û danî ser birîna Rihanê, ew birîna ku zêde ne kûr bû. Guleyê çerm qelişandibû û derbas bûbû.

Ber bi êvarê hevalên Mirad hatin. Gava Mirad ew ji dûr va dîtin, ber bi wan va çû, got:

– De lawikino bêjin, çi heye, çi tune?

Hingê, hevalên wî gotin, ku Seydo Axa gelek hêrs bûye; peyayên xwe şandiye ser hemû riyan, lê dîsan jî tu tişt nebihîstine.

Mirad pirsî, got:

– Peroya cariya wan xeber dabû wan?

Yekî got:

– Ew di mala Hesen da bûye, gava nihêriye, Rihan tune, çûye û ji Casim ra gotiye. Casim jî hemû peyayên xwe rakiriye û bi pey me ketine. Wexta di riya bal mezelan ra tên yek me dibîne, lê yek ji wan dibêje: "Ma çima ew dê ber bi mezelan va bên û li vir bisekinin? Ew niha wekî birûsk direvin". Yekî din jî dibêje: "Em agir bikin, heke ew bin dê bersiva agirê me bidin". Casim di pêş wan da ye, ew agir dike. Dinihêrin, ku em bersiva agirê wan nadin, dibêjin "kes li vir tune" û bi riyeka din va diçin.

Mirad dîsan pirsî, got:

– Ew niha texmîn nakin, ku em li ku ne?

Hevalên wî gotin:

– Na, ew nizanin. Loma jî rind nagerin. Heke Rihan hinek pak bû, sibê şeveqê rabin, bi rê bikevin û ji vir herin. Te hew dît hatin van deran, kî dizane?

Êdî gelek ji şevê derbas bûbû. Çavên Rinanê girtîbûn, lê hişyar bû, gotinên Mirad û yên hevalên wî dibihîst. Gava wan xeberdana xwe kuta kir, Rihanê çavên xwe vekirin, bi destê Mirad girt û nerm givaşt, got:

– Mirad, heke hûn ji bo min li vir sekinîne, naçin, hema niha karê xwe bikin û em herin. Ez baş im, rast e ez vê sibê pirr xerab bûm, lê niha piştî wî dermanî ez baş im. Ez dê bikaribim bêm, netirse. Ez dê heta şeveqê baştir bibim, em zû ji vir herin.

Gava Mirad ev gotin bihîstin, rihê wî teze bû, rih bi qudûmên wî da hatin, bi eşq got:

– De wekî wisan e em dê sibê êvarê bi rê bikevin. Bila birîn hi-

nekî din jî bikewe. Wisan qerar girtin.

Wê şevê, Rihan rehettir raza. Ji sibê va karê xwe kirin, ku êvarê bi rê bikevin.

Hevalên Mirad dîsan çûbûne gund, dereng hatin. Gava Mirad çav bi wan ket gelek şa bû, li nav çavên wan nihêrî; wî dixwest tê derxe gelo tu qeza ne qewimîne. Wan rewşa Mirad Fêm kir û bi ken gotinê:

– Mirad, qet nefikire, her tişt rind e. Tenê dimîne Rihan, ku Rihan zû baş bibe û hûn zû ji vir bi rê bikevin. Seydo Axa û kurên xwe, xwe dikujin, lê nizanin bi ku da herin, bi kur va neçin. Gundî gişk di derheqa te da xeber didin û şa dibin, ku vê carê mirazê Seydo Axa nebû. Bila Seydo Axa jî bizanibe, ku gundî jî meriv in. Lê Mirad hûn çiqas zû ji vir herin ewqas baştir e.

Rihanê got:

– Hûn rast dibêjin. Çiqas zû be ew qas rind e. Ew niha bi şev jî li me digere. Em dê îşev bi rê bikevin.

Wisan jî kirin. Karê xwe kirin, Rihanê dida xuyakirin ku ew pirr baş e, lê ya rastî ew gelek diêşiya, lê ji bo xatirê Mirad dengê xwe nedikir. Gava ji şevê gelk bihurî, Mirad nêzîkî Rihanê bû û got:

– Rihan, rast bibêje, tu dikarî îro bi rê bikevî an na? Heke tu nikaribî em dê îro jî bimînin.

Rihanê li Mirad nihêrî û bi ken got:

– Ez pak im. Ez zaf baş im. Tu netirse, ez namirim, tu tişt bi min nayê, lew tu li bal min î. Niha tu kes êdî nikare me ji hev biqetîne, me ji hev dûr bike. Tu bixwazî em dikarin niha jî bi rê bikevin.

Mirad bi eşq rabû çû derve bal hevalên xwe, got:

– De hevalên min yê ezîz êdî wext nêzîk dibe, em bi rê bikevin. Hesp anîn, Rihanê lê siwar kirin û berê xwe dane riya Tiblîsê. Mirad got:

– Hevalino, hûn êdî vegerin. Ez ji we pirr razî me, min ji bîr nekin.

Hingê yekî ji Mirad pirsî, got:

– Mirad, tu dizanî ku me çiqas ji te hes dikir? Em tim bi hev ra bûn, em tu caran te ji bîr nakin. Ev mêraniya ku te kir tiştekî mezin e, te ji me ra jî rê vekir.

Hevalên Mirad nêzî wî bûn, çûne dest û rûyên hev û xatir ji hev xwestin. Hingê yekî ji Mirad pirsî, got:

– Tu dê kengê bi aliyê me da bêyî?

Mirad got:

– Çaxê ku Seydo Axa tunebe...

Dîsan xatir ji hevalên xwe xwest û bi rê ket. Rihan û Mirad li ser hespê hev ramûsan. Zelxo ji kêfan nizanîbû çi bikira, li wan nihêrî û şad bû.

# MIZGÎN

Rojeke biharê ya xweş bû. Roj du bejin bilind bûbû. Tavê dabû deşt û baniyên ku ji dûr va wek xalîçeyên rengîn xuya dikirin. Aviya ku êvarê ketibû ser gul û sosinan hîn dibiriqî. Kalekala kar û berxan, hokehoka şivan û berxvanan ji gund dihat. Li perê gund, ji dûr va dengê traktoran dihat. Bedîl û qîza wê Zînê vedigeriyane malê. Herdû jî di kolxozê de çêlekdoşên pêş bûn. Dê û qîz bi ken bi hev ra diaxivîn û ber bi malê dihatin. Ji nişka va nihêrtin ku kurê cînarê wan Mecîd wa ber bi wan direve û dike gazî:

– Xatiya Bedîl, Zînê... mizgîniya min... Selîm hatiye!

Gava dê û qîzê navê Selîm bihîstin, dinya wan ronahî bû. Ber bi malê bezîn. Zînê berî diya xwe giha malê, birê xwe hemêz kir, ramûsa û got:

– Birê min î şêrîn, perrên min, min çiqas bêriya te kiribû...

Wê digot û birê xwe radimûsa. Selîm jî xuwîşka xwe radimûsa. Gava Bedîl gihîşte malê, kurê xwe hemêz kir, da ber dilê xwe. Ji şabûna hêsir ji çavên wê dibarîn. Paşê dê û kur li kêleka hev rûniştin. Xwîşk û birayên Selîm lê civiyabûn û ji xwe ra şa dibûn. Paşê wî ji diya xwe pirsî, got:

– Dayê, Tahir çawan e, ew dê kengê bê?

Diya wî got:

– Kurê min, wî ji min ra nivîsîbû, ku dê îmtîhanên xwe xelas bike û bê.

Di wê demê da çend cînar ji der da hatin, çavronahî dane Bedîlê û eniya Selîm maçî kirin. Ew hê rûneniştibûn, merivekî bejinbilind

û beşerxweş ber bi wan va hat. Yekî pirr kesirî bû. Serokê kolxozê Yûsivê Xeto bû, got:

– Siba we bi xêr! Çavên we bi ronî!

Paşê nêzîkî Selîm bû, çû eniya wî, qasekî li wî nihêrî, simbêlê xwe bada û got:

– Maşela... Selîm maşela! Tu di nav du salan da çiqas hatî guhastin? Tu çiqas tijî bûyî, çiqas bedew bûyî, weleh Kawê te bibîne qet nas nake. Selîm sar bû, serê xwe kire ber xwe. Yûsiv lê nihêrî, ku Selîm şerm dike, gotina xwe guherî û jê pirsî, got:

– Lê tu çawan awa zû hatî?

Yûsiv li hêviya bersiva wî bû. Selîm got:

– Hevalê Yûsiv, bi qerarê hikumetê pirr leşker ji wextê xwe zûtir vegeriyane mal. Yek ji wan jî ez im.

Wisan got û bi ken li Yûsiv nihêrî.

Bedîlê ku navê Kawê bihîst, bi eşq li kurê xwe nihêrî û got:

– Erê, erê rast e, wele bibexşîne min ev yek ji bîr kiribû. Ez qurbana te û destgirtiya te bim, tu çira şerm dikî? Kawê qîzeke delal û bedew e, bi namûs e... Heta niha hîn tu kesê gund negotiye wê ev şaşî kiriye.

Hingê Yûsiv got:

– Erê welle, li ser bextê min Kawê qîzeka hêja ye, jîr e, nolî pirîskê ye. Gava tê dest bi karê xwe dike, hewes û heşmetkariya meriv pêra tê. Ew dê wek çêlekdoşa pêşîn bi Zînê ra here Moskovayê.

Gava Selîm navê Zînê bihîst, pêra pêra li xwîşka xwe vegeriya û gotê:

– Xuşka min ya delal, ez bi destanên te zaf kêfxweş dibûm.

Wan wisan bi hev ra xeberdan dikir, Bedîlê hahaka texte rast kir, kas tijî kirin. Yûsiv li xelkê dinihêrî û got:
– Ez vê kasê ji eşqa mala we vedixwim, berî herkesî ji eşqa xwîş-

ka Bedîlê; ya ku deh zaro terbiye kirine. Deh zaro ne tiştekî henek e, meriv xwedî bike, mezin bike û hikumeta Sovyetê zaf rast gotiye, ku navê wê daniye “Diya Mêrxasan”. Yûsiv kasa xwe bi ser xwe da kir, xatir ji wan xwest û derket, lê hema ji ber derî vegeriya û gote Selîm:

– Selîm, sibê were cem min da ez traktora te dîsan teslîmî te bikim. Selîm şa bû û ji serokê kolxozê re spas kir.

Selîm wê rojê heta êvarê deqeyekê ji malê derneket. Lew meriv û pismamên wî dihatine cem; yek radibû yek rûdinişt.

Selîm êvarê dereng raza. Lê gelo ew raza? Na, ew di nav ciyê xwe da difikirî. Ew difikirî, ku ew dê dîsan li ser traktora xwe bixebite û di derheqa Kawê da difikirî. Ew şa dibû, bêsebir bû, li benda şeveqê bû.

Ew bi vî awayî heta berbanga sibê hişyar ma. Lê xewa berbangê lê zor kir, çavên wî yên reş giran bûn, hatine girtin. Lê piştî saetekê ew careke mayîn hişyar bû. Wî li derva nihêrî û dilê wî ji şabûnê lêxist. Gava texmîn kir, ku êdî sibe ye, rabû kincên xwe li xwe kir; pêşgîr û sabûn hilda çû ser kaniyê. Gava ew derketibû derva kesek tunebû, lê bi rê da qîz û bûkên gund rastî wî dihatin, ji kaniyê dihatin. Wî çavên xwe li Kawê digerand.

Ew çû li ber kaniyê rûnişt, destên xwe bi ava sar î wek qeşemê şûşt. Paşê hinek ava sar vexwar. Di wê demê da bû xişexişa çayirê, dengê lingan ji pişt wî va hat. Li pişt xwe zivirî, bû mîna risas, reşeşevî bi ber çavên wî va hat; ling lê sist bûn, dest lê lerizîn. Qîzeke delal, Kawêya bejinzirav û çavreş ber bi wî dihat. Guliyên dirêj kiribû du kit û mîna marên reş bi navmila nazik da berda bû. Ew bi deng bi hevala xwe ra dikeniya. Diranên qerqaş nolî sedef dihatine kivşê. Te dê bigota gul û nûr lê dibarin. Gava ew nêzîkî kaniyê bûn, wê Selîm dît û kire îskînî, di cîh da ma. Gava Selîm ev yek dît ber bi wê çû û bi destê wê girt...

# WEŞANÊN NÛDEMÊ

- BINGEHÊN GRAMERA KURDMANCÎ **Celadet Alî Bedir-Xan** / Gramer
- DÊ Û DÊMARÎ **Egîdê Xudo** / Roman
- KESKESOR **Nûredîn Zaza** / Çîrok
- DI FOLKLORA KURDÎ DE SERDESTIYEKE JINAN **Rohat** / Lêkolîn
- HÊZ Û BEDEWIYA PÊNÛSÊ **Mehmed Uzun** / Ceribandin
- MÎRZA MEHEMED **Medenî Ferho** / Roman
- MILKÊ EVÎNÊ **Rojen Barnas** / Şiîr
- ZAROKA ŞEVÊ **Jack London** Werger: **Mustafa Aydogan** / Çîrok
- BIYANÎ **Albert Camus** Werger: **Fawaz Husên** / Roman
- MÎRZAYÊ BIÇÛK **A. de Saint-Eksupéry** Werger: **Fawaz Husên** / Çîrok
- GOTIN **Yaşar Kaya** / Ceribandin
- ANTOLOJIYA ÇÎROKA NÛ YA KURMANCÊN BAŞÛR **Xelîl Duhokî**
- ŞEVÊN SPÎ **Dostoyevskî** Werger: **Firat Cewerî** / Roman
- MIŞK Û MIROV **John Steinbeck** Werger: **Firat Cewerî** / Roman
- BEXÇEYÊ VÎŞNE **Çexov** Werger **Firat Cewerî** / Piyes
- LI BENDA GODOT **Samuel Becket** Werger: **Firat Cewerî** / Piyes
- GOTINÊN NAVDARAN Amadekar: **Firat Cewerî** / Aforîsma
- GIRTÎ **Firat Cewerî** / Çîrok
- KEVOKA SPÎ **Firat Cewerî** / Çîrok
- KULTUR, HUNER Û EDEBIYAT **Firat Cewerî** / Ceribandin, hevpeyvîn
- XEZAL **Sîma Semend** / Çîrok
- EVÎNA REBEN **Derwêş M. Ferho** / Şiîr
- BANGA HAWARÊ **Medenî Ferho** / Şiîr
- KULTUR Û RAMAN **Şerefxan Cizîrî** / Ceribandin
- KURÊ ZINARÊ SERBILIND **Sidqî Hirorî** / Roman
- DERWARÎ **Yusufê Cerihî** / Şiîr



**Sîma Semend** di sala 1933'an de li navçeya Axbaranê (Sovyeta kevin) hatiye dinyayê, di sala 1958'an de fakulteya fîlolojiyê li unîversîteya Êrêvanê xelas kiriye û paşê bûye redaktora beşa kurdî ya radyoya Êrêvanê. Ew heta niha jî di wî karê xwe de dixebite.

Sîma Semend bi prosayê dest bi nivîskariyê kiriye û nivîskariya xwe bi prosayê jî berdewam dike. Wê heta niha du pirtûkên çîrokan nivîsandiye û di antolojiyan de jî cih girtiye. Weşanxaneya me *Xezal* ku cara pêşî di sala 1961'ê de bi tîpên krîlî li Êrêvanê hatibû weşandin, bi niyeta teşwîqkirina keç û jinên kurd, bi serbilindî pêşkêşî pirtûkxaneya kurdî dike.

**Weşanên Nûdemê**